





## Di nav şewqa şevê de Keleha Zêrzewan

Keleha Zêrzewan, keleheke di neqeba Amedê û Mêrdînê de ye. Xwedî dîroka 3 hezar salan e û di serdema Împeratoriya Romayê de, wekî devereke leşkerî hatiye bikaranîn.



Li çepka naxim...  
Li çepka naxim...  
Ji bo êşek nû, li şûna girî  
Li çepka naxim...  
Serê bawerya, himberî topa  
Tucar danaxim...  
Veşartiyên dil, li sikakên rût  
Ez belav nakim  
Bazar hîn sar e  
Xewn û hêviyên xwe  
Erzan ranaxim...  
Heger ba neyê, ezê xwe kerr 'kim  
Ji bo kuştina, mêş û kelmêşa  
Şûr ji zik kalan  
Zû b' zû dermaxim...  
Payîz bihirî  
Çile zivirî  
Li ser axa xwe, tev reh û şaxa  
Hîna bin axim

Ferhadê ÎÇMO

WÊNE: SAMAL TOFIK/BALAKAYATÎ

# Gotarên li ser Hemîdo

► Esas, vê meseleya Kurdbûna wî berê zêde bala min jî nedikişand ser xwe. Lê piştî ku min çavê xwe li arşîvên radyo û televîzyona fermî ya Awusturyayê ORF'ê gerand, nûçeyekê behsa Kurdbûna Hemîdo û behsa pirsgirêka Kurd a nehatiye çareserkerin dikir.

► Kurdbûna Hemîdo ji gotarên fermî yê dewletê bi zanebûn hatiye derxistin û di gotarên akademiya dewleta Tirk de jî bi qest Kurdbûna wî hatiye besîtkirin: Tenê weke amûreke ji Kurdbûnê û "kurdperweriyê" dîrxistina milletê Kurd ê li Meletî û derdora wê Kurdbûna Hemîdo hîna li ser meqaleyan heye.



Li mala xwe paketeke ji Enqerê bi postê jê re hat şandin, bi gumana çixare yan jî diyariyeke ji bo zarokan be li cem neviyên xwe û bûka xwe vekir. Roja 17'ê Nîsana 1978'an, bi vekirina paketê re pê hisiya ku bombe ye, lê nekarî tiştê bike. Hemîdo (Hamit Fendoglu) tevî du neviyên xwe û bûka xwe di encama êrişê de hat qetilkirin.

Kê êriş kir, çima? Heta roja îro jî ev nehatiye safîkirin.

Jixwe êrişêke siyasî li Tirkiyeyê gava nehatibe safîkirin, kirde dewlet bixwe ye\*. Lê meseleya ez ê li vir pê dakevim, wê berê xwe nede kirde yê ku dewlet perdeyê diavêje ser. Meseleya min wê bibe, Kurdbûna Hemîdo û ya Meletiyê.

Rast e, Hemîdo siyasethanekî muhafezekar bû, lê ew Kurd bû. Ne tenê li Tirkiyeyê, li derveyî wê jî weke Kurd hat naskirin. Lê belê çi qewimî ku biraziyê wî Mehmet Celal Fendoglu ji partiya nijadperest a Tirk MHP'ê sala 2018'an bibe parlamenterê Meletiyê? Gava ku ew ji ajansa fermî a dewleta Tirk re 25'ê Hezîrana 2018'an peyivî, careke tenê ji behsa Kurdbûna apê xwe nekir.\*\*

Em îro berê xwe bidin qetla Hemîdo û bûyerên piştî qewimîn, em dibînin ku xasma dîrok û bûyernivîsiya bi Tirkî, behsa Kurdbûna wî hiç nake. Ji veşartinê û wêde, Kurdbûna wê tê tînekirin. Heta em berê xwe bidin, rojnemavan, lêkolên Kurd jî em dibînin ku ew



Luqman GULDIVÊ

jî êdî bi vî aliyê ku diyar e ji bo wan îro talî ye û berê esasî bûye, danakevin. Mehmed Mazlum Çelik ji The Independent Türkçe re bi sernivîsa "Parlamentonun sevilen kabadayısı, Malatyalı Hamido'nun meçhul ölümü (Mirina nediyar a qubedeyê hezjêkirî yê parlamenê Hemîdo yê ji Meletiyê)" li ser Hemîdo nivîsiye\*\*\*. Di temamê nivîsê de careke tenê behsa Kurdbûna

wî nayê kirin. Mirovekî nizanibe ew Kurd e, wê nizanibe ku behsa siyasethanekî Kurd tê kirin.

Di nivîsê detayên herî piçûk ên qubedetiya Hemîdo hene, lê Kurdbûna wî nîne. Behsa eşîra wî Îzolan dike, behsa hevaltîya wî ya bi Ozal re dike, lê weke ku ne Kurd be.

## Kurd e û pirsgirka Kurd heye

Esas, vê meseleya Kurdbûna wî berê zêde bala min jî nedikişand ser xwe. Lê piştî ku min çavê xwe li arşîvên radyo û televîzyona fermî ya Awusturyayê ORF'ê gerand, min guh da nûçeyê li ser kuştina Hemîdo jî. Nûçe 19'ê Nîsanê saet 13:25'an hatiye weşandin. Bi temamî 4 deqîçe û 15 saniyeyan dewam kiriyê. Bulten bi xwe, ya nûçeyên nivrojê ye bi navê Mittagsjournal û bi temamî qedere saetêkê dewam dike.

Sernavê nûçeyê bi serê xwe bes bû ku ez bala xwe xweşik bidimê: Türkei - Unruhen wegen ungelöstem Kurdenproblem (Tirkiye: Nearamiyên ji ber çaresernekirina pirsgirêka Kurd).

Yanî behsa Kurdbûna Hemîdo tenê nedikir, behsa pirsgirêka Kurd dikir, ew pirsgirêka ku nehatiye çareserkerin. Heger wisa bû, naxwe ew nûçeyên Kurdbûna Hemîdo nexuya û heta tine dikin, ne bêgûneh in. Jixwe di akademiya de hebûna çend nivîsên li ser "helwêsta" akademîk, diyar bû ku îşaret bi tiştêkî ji nexuyakirinê û wêde dike. Mesela Canan Katılmış û Abdulkadir Baharççek\*\*\*\* di meqaleya xwe de behsa "Tesîra Hamit (Hemîdo) Fendoglu li ser veguherîna siyaseta cihî li Meletiyê" dike. Di vê meqaleya par weşandî de ji hesasiyeten akademîk bêhtir, em hesasiyeten ji bo yekparebûna dewleta Tirk û meseleya tînekirina nasnameya Kurd eşkere dibînin. Di vahiya meqaleyê de neteweperestiya wî ya Tirk tevî muhafezekariya wê tê îfadekirin. Lê hin tesbîten di meqaleyê de ne şaş diyar in: "Hamit Fendoglu endamê du eşîrên mezin Îzol û Rişwanan e. Hingê otorîteya herdu eşîran hem li Meletî û hem jî li bajarên cîran gelek bû." Hema piştî van gotinan, gotinên binîyet û şirove tî: "Hem rêza di nava van eşîran de jê re dihat girtin û hem jî ji ber ku Kurdî xwe xweş îfade dikir, gelê Kurd ê li herêmê dûrî tesîra terora cudaxwaz kiriyê." (r. 28)

Jixwe şaşiyên madi yê ku Ala Rizgarî û PKK'ê weke yek rêxistin nîşan didin, eşkere dikin ka di warê akademîk de ev zebat xwedî qîmetêke çawa ne. Lê bi giştî ew meyla ku ji Hemîdo figurekî "rizgarkirina" Meletî û derdora wê ji "Kurdperweriyê" hem di vê meqaleyê de û hem jî di yê weke wê yê di serdema desthilata AKP'ê de derdikevin pêş.

**Bajarên herêmên Kurdan: Meletî, Entab û Mereş**

Ji ber wê jî nûçeyî li ser qetla Hemîdo û bûyerên paşê qewimîn ya di arşîva ORF'ê de ji bo min muhîmtir dibû. Ne tenê sernavê nûçeyê, her wiha naveroka wê jî li ser kurdbûna Hemîdo û kurdbûna Meletî, Entab û Mereşê hatibû avakirin. Wolfgang Pfeiffer gava behsa bajêr, Hemîdo û piştgirên wî dike, ileh vê yekê bi îşaretkirina bi kurdbûna wan dike. Gava vê dike jî, meseleyê di nava pîrsgirêka Kurd de bicîh dike. Mesela kuştinên siyasî li Tirkîyeyê gelekî belav in, lê ew jî bo kuştina Hemîdo jî wan qut bike dibêje, "Lê wê carê jî ber sedemeke din li Tirkîyeyê nearamî û arîşê çêbûn, jî ber pîrsgirêka Kurd a ku hîna jî li rojhilatê welêt nehatiye çareser kirin."

Gava ew behsa malmezîniya wî dike jî, eşîra Hemîdo jî weke Kurd bi nav dike û xwe jî Xwedê nake: "Şaredar jî malmezînen eşîreke xurt a Kurd bû." Jixwe bûyerên diqewimîn ji ew yekser elaqedarî eşîra wî ya Kurd dike û dibêje hem li Meletiyê û hem jî ji derdora wê endamên eşîrê daketine bajêr.

Wolfgang Pfeiffer xweşik haydar e ji meseleya arîşê û heta şerên çepgir û rastgirên li Tirkîyeyê. Lê ew vê bûyerê di nava çarçoveya teng a arîşeya çepgirî û rastgirîya li Tirkîyeyê de asê nake: "Tevgerên siyasî yên ku mirov dikare têkiliya wan bi êrişan re deyne, bi nakok in. Bi her halî ew zêde dikin li wê danberhev û arîşeya di navbera texmîni bi milyonan Kurdên Tirkîyeyê û hikûmeta navendî ya li Enqereyê."

Lê ya jî wê jî muhîmtir, ew qebûla giştî ye ku bajarên Meletî, Entab û Mereşê Kurd dibîne. Her sê bajarên ku Kurdbûn li wan îro tenê hindikahî ye yan jî mîameleya hindikahiyê pê re tê kirin, ji bo Wolfgang Pfeiffer eşkere Kurd in: "Ne tenê jî ber ku ev êriş, agirîkî nû zêde dike li berxwedana Kurd li dijî Enqere ya ku daimî hatiye bincil kirin..., lê belê jî ber ku di dema heman êrişê de li du bajarên din ên herêma Kurdan, Entab û Mereşê jî bombe hatin tesbîtkirin."

**ORF ne bi tenê ye**

Gelo Wolfgang Pfeiffer tenê mesele wisa didît? Ji kovarên heftane yên siyasî yên herî bi tesîr ên hingî, Der Spiegelê du rûpelên xwe ji kuştina Hemîdo re veqetandine û sernûçeyê wê jî "Tolhildana ji bo Hemîdo" ye\*\*\*\*\*. Nûçe li ser hewldanên jidesthilatxistina Bulent Ecevit hatiye avakirin. Lê gava mesele dibe Kurdbûna Hemîdo, ew di rêza yekê de tê gotin: "Hêrsa girseyên hov li dijî her tiştê bû ku weke çepgir karibe bê ditin. Lewma Hamid Fendoglu rastgir bû, Misilmanekî ortodoks û Kurd bû. Ji gundên Kurdan cotyarên çekdar xwe berdan bajêr, ..." Nûçe wisa hatiye danin ku behsa rola "dewleta kûr" a Tirk bike di kuştina Hemîdo û her wiha bikaranîna wê jî bo xistinajidesthilatê ya Ecevit de. Yanî nûçe bi hev girtina nijadperestiya Tirk û eşîrên Kurd, hêza li pişt wê daketiye.

**Li şûna encamê**

Di encamê de ez bi rehetî dibînim ku Kurdbûna Hemîdo jî gotarên fermî yên dewletê bi zanebûn hatiye derxistin û di gotarên akademiya dewleta Tirk de jî bi qest Kurdbûna wî hatiye besîtkirin: Tenê weke amûreke ji Kurdbûnê û "kurdperweriyê" dîrxistinina mîletê Kurd ê li Meletî û derdora wê Kurdbûna Hemîdo hîna li ser meqalayên heye. Awirêkî seresere jî bi hêsanî nîşanî me dide, ku têgihîştina hingê ya li vî bajarî a li ser Hemîdo, xelkê bajêr li ser Kurdbûna wî, ji wê ya ku gotarên fermî destûrê didînin bê ditin, cihê ye û jê wêde ye jî.

Axir hem gotarên piştî kuştina Hemîdo hatin avakirin û hem jî yên niha tînan avakirin, hem Kurd-

aus Aktivisten bestehenden und im Widerstand kämpfenden Partei" entspreche und deshalb der Vergangenheit des Bürgerkriegs vor 40 Jahren angehöre.

Dem zukünftigen, demokratisierten Spanien, so Carrillo im April vor dem ersten legalen Parteitag seit 46 Jahren, komme seine Partei mit dem „demokratischen Kongreß aller spanischen Parteien“ entgegen: Jeder dürfe reden, kritisieren, Anträge stellen und für das Zentralkomitee kandidieren.

Obwohl schließlich die Genossen mit Vierfünftel-Mehrheit den Grundsatz des Marxismus-Leninismus aus den Statuten strichen, hielten sie am demokratischen Zentralismus ausdrücklich fest — „weil wir eine revolutionäre Partei bleiben“, begründete Carrillo diesen Widerspruch.

schen Genossen bleibt der demokratische Zentralismus vor allem ein Mittel, die verschiedenen Strömungen auf den einzelnen Parteiebenen zu bündeln (Konsensmodell). Diskussionen, gar Kritiken wie beim spanischen Parteitag sind angeblich unnötig. ZK-Mitglied Sergio Segre: „Das haben wir bereits hinter uns.“

Als jedoch die prominenten ZK-Mitglieder Luigi Lombardo-Radice und Umberto Terracini vor drei Wochen einen Appell unterschrieben, der die Regierung zu Verhandlungen mit den Moro-Entführern aufrief, wurden sie offiziell in der Parteizeitung „l'Unità“ wegen ihrer von der Parteilinie abweichenden Haltung getadelt. Lombardo-Radice mußte sich öffentlich von seiner Unterschrift („Das hatte ich nicht gewollt“) distanzieren.



Militär, Auführer in Malatya: „Solche Aktionen kommen nicht von Kindern“

**TÜRKEI**

**Rache für Hamido**

Die bewaffnete Rechte schürt einen Bürgerkrieg, um den sozialdemokratischen Premier Ecevit zu stürzen.

Schokolade für seine Enkel vermutete Hamid Fendoglu, Bürgermeister der ostanatolischen Stadt Malatya, in einem Paket, das aus Ankara an ihn abgeschickt worden war.

Als er es öffnete, wurden er, seine Enkel Ahmed und Bozkurt sowie seine im achten Monat schwangere Schwiegertochter von der Explosion einer Pflü-Pfund-Bombe zerrissen. Nur seine Frau, die sich im Nebenzimmer aufhielt, überlebte das Attentat.



bûna wî, ya Meletiyê nexuya û heta tine dikin û hem jî rol û mîsyoneke nû didin siyaseta Hemîdo: Ji "kurdperweriyê" dûr kirina Kurden wan bajaran.

Gava em îro berê xwe didin rewşê, em dikarî bibêjin ku stratejiyên komkuji, dubendkirin û avakirina gotarên ji bo wan stratejiyan, ev armancên dewleta Tirk qismî birine serî. Lê ma, gelo divê gotarên di nava Kurdan de jî li gorî vê tevbigerin yan hewl bidin ji hev derbixin ka çi qewimî? Meyla min jî bo ya diduyê ye.

\* Ajansa fermî ya dewleta Tirk 20'ê Nisana 2010'an bi hev jîna Hemîdo (bi Tirkî Hamido), Mukades Fendoglu re peyivîye. Ew jî dibêje, "Ez difikirim, bûyer elaqedarî Ergenekonê be."

\*\* <https://www.aa.com.tr/tr/politika/hamidonun-yegeni-vekil-oldu/1187058>

\*\*\*



# Temamê metna nûçeya li ser bûyerên piştî kuştina Hemîdo

## Tirkiye - Nearamiyên ji ber pîrsgirêka Kurd a nehatiye çareserkirin

Çawa ku diyar e, li Tirkiyeyê mînaqêşeyên siyaseta navxweyî ne tenê bi gotinan tê kirin, lê belê gelek caran bi sîlehê. Beriya hilbijartinên parlamen û şaredariyan kuştinên siyasî ne kêman in. Lê wê carê ji ber sedemêke din li Tirkiyeyê nearamî û arîşe çêbûn, ji ber pîrsgirêka Kurd a ku hîna jî li rojhilatê welêt nehatiye çareserkirin. Siyasetvanekî Kurd bi bombeveke nameyê hat kuştin, ev jî çirûskeke nû bû ku berdan nav fiçiya barûdê ya siyasî. Wolfgang Pfeiffer paşxaneya bûyerên nearamiya siyasî yê herî dawiyê analîz dike:

Kuştinên siyasî, terora ku ji salan ve her bi rengê zêde dibe welêt dixe nav lepên xwe, wisa xuya ye ku dikevin qonaxeke li pêştir. Ev cara yekê ye ku hêzên artêşê bi cîlûberg û techîzata xwe ya şer bajarekî Tirkiyeyê yê serjimara wê sedhezdar dagir kirin. Deverên stratejîk muhim wan bi dest xistin, û hiştin ku qederê hezar kesî bi awayekî demkî bigirin.

Şaredarê bajarê rojhilatê Tirkiyeyê Meletiyê, û sê endamên malbata wî bi bombeveke hatibûn kuştin, a ku di nava paketekê de ya ku li Enqerê dabûn postê û postê biribû mala wî.

Şaredar ji malmezînen eşîreke xurt a Kurd bû. Çawa xebera kuştina wî belav bû, xelkên eşîra wî li nava bajarê Meletiyê rabûn ser piyan, û ji deverên şên ên çiyayî yê li derdorêberê jî bi dehhezaran mirovên din daketin bajêr. Şaredarê hatî kuştin di hilbijartinên herî dawî yê cihî de weke siyasetvanê serbixwe ketibû hilbijartinê, lê belê bi alîkariya partiyên muhafezekar weke şaredar hatibû hilbijartin.

Girseyên hêrsabûyî li gelek deverên bajêr agir dadan, bi polês re şerê kuçeyan kirin, avahiyan rêxistinên çepgir xira kirin, di nava wan de buroya partiya hikûmetê ya li Enqerê jî hebû.

Piştî ku yekîneyên artêşê daketin bajêr, derketina kolanan a bi şev hat qedexekirin, sînema, dibistan û qehwxane hatin girtin.

Kuştinên siyasî li Tirkiyeyê heta niha di navbera tundrawên çepgir û rastgir de bûn. Hejmara ku ravedarên hikûmetê ji bo tenê van çend mehên îsal 114 e. Muxalefet behsa bi sedan kuştinan dike.

Kuştina li Meletiyê divê bi maneya xwe ji bûyerên terorê yê heta niha yê li Tirkiyeyê û wêde biçê. Ne tenê ji ber ku ev êriş, agirêkî nû zêde dike li berxwedana Kurd li dijî Enqere ya ku daimî hatiye bincilkirin û di wir de weke perengan her dişewite, lê belê ji ber ku di dema heman êrişê de li du bajarên din ên herêma Kurdan, Entab û Meresê jî bombe hatin tesbtkirin. Yek di otobusekê de teqiya, ya din jî beriya ku bi teqe bi demêke kurt di mizgeftêkê de hat dîtin.

Tevgerên siyasî yê ku mirov dikare têkiliya wan bi êrişan re deyne, bi nakok in. Bi her halî ew zêde dikin li wê danberhev û arîşeya di navbera texmînî bi milyonan Kurdên Tirkiyeyê û hikûmeta navendî ya li Enqereyê; ev arîşe jî bi salan e bi tevahiya hêzê jî awirên ji derve tê veşartin.

Di wê meseleyê de di warê analîzê de qismî cihê gumanê ye ku mirov Kurdan li çepgir û rastgir, li muhafezekar û pêşverû dabeş bike, tevî ku ew carinan bi komên partiyên ên van benden hevkarîyê jî bikin, çawa ku şaredarê hatî kuştin jî kiribû. Esas ew nûneriya kurdbûna xwe dikin.

*Li ser nearamiyên herî dawiyê yê li welatê Kurdan ê li Tirkiyeyê, Wolfgang Pfeiffer ragihand.*

\* Mittagsjournal 1978.04.19 (Ji deqîya 25:35 heta deqîqeya 29:47 a bultenê dewam dike, yanî bi giştî 4 deqîqe û 15 saniyeyan); Hans Vockenhuber moderatoriya bultenê dike û Wolfgang Pfeiffer nûçeyê radigihîne. Qeydiya deng li Audiovisuelles Archiv - Technisches Museum Wien û Österreichischer Mediathek 2021 e û wan bi destûra ORF ev qeydî dijital kiriye û online weşandiye.



Abuzer Aşkinses li ser Hemîdo piştî kuştina wî li gorî adetê li ser Hemîdo straye. Li jêr destpêka wê stranê bi we re par ve dikin\*:

De lo le yan e, yan i yan i lo Reso\* yan e

Lo lo Reso qurban sermere lo li ber bilind î, zozan çiyana

Weylo dilê mi girtî lo li ber dûman e

Ez ê dilo dibêm, Hemîd Fendoglı,

başqanê beldiya Meletya lo gir

xopan e

De heywax heywax lo Reso heywax li mi

Lo lo Reso dibê ro bilind i, lo ro bilind i, lo li xwe daketi

Heylo hiro darê nûcema e, wey bi rebê celîl lo hiro li guret i

Heylo Reso qurban heyfa lo canê te tê

Heylo mi çi dizanî li serê bu begê mi daynê heywax heywax lo wê felaketê

Heylo Reso qurban tu hiro li reîsê lo dîn dewletê

Heylo li ber belediyê tê lê sewta hiro postê lo wê dewletê

Heylo hemî devera, her ciha hikûmetê Enqera lo miro lo li wekaletê lo heywax heywax lo Reso heywax

Weylo de yan i yan i, yan yan i, lo Reso yan i

Lo lo Reso weleh ti çiyayê minî bilind î lo li ber dilan î

Hewala qulê wê zemanî lo li mi nezani

Heylo te hiro topa koma Meletya xopa lo li xwe radanî\*\*

...

\* Reso mamûrê postê ye ku paketa bi bombe daye dest Hemîdo.

\*\* Stran li ser youtube bi temamî heye: <https://youtu.be/Ej6kxh8YClS>



Bi Mîrhem Yigit re ceribandineke dîroka devkî

# Bihara Kurdan li Pragê

► Gava ez li Sofiyayê bûm, kongreya KSSE'yê hebû. Li wir jî em ketin kongreyê. Kemal Cengîz Hebû, kurdekî ji DDKO'yê bû, em bi hev re ketin kongreyê. Me di kongreyê de tiştek [peyameke nivîskî] bi navê Xwendekarên Kurd ên Bakur da kongreyê. Têkiliya min her zû dest pê kiribû bi komele û xwendekaran re.

► Şahê Îranê çend kes îdam kiribûn, me jî li dijî wê îdamê li Pragê, li Çekoslovakayê belavokek derxistibû. Ew beyan di kongreyê de bû problemeke cidî. Minaqeseyeke mezin li ser bû. Gotin, çawa hûn dikarin li dijî Îranê, ku ewqasî dostê me ye belavokê binivîsin. Îca Samî Ebdurehman rabû axivî, got, "Em bi ti şiklî qebûl nakin ku şûbeyek ji yên KSSE'yê li dijî Şahê Îranê tiştekî bêje.



İsmet KAYHAN

Mîrhem Yigit yek ji wan xwendekaran bû ku bi bursa Mûsa Anter eyarkirî di derveyî Tirkiyeyê xwendin. Ew sala 1969'an çû paytexta Çekoslovakaya hingê, Pragê. Di dema xwendekariya xwe ya li Pragê, û paşê çalakîya xwe ya li Swêd û seranserê Ewropayê de, ew hem bû şahidekî qewmînên di nava siyaseta hingê ya Kurd a li Ewropayê û hem jî di nava wê de yek ji aktorên bû. Bi vî awayî gotinên wî belgeyên şahidiyêke dîrokî ne ku navên weke Necmettin Buyukaya, Ebdurehman Qasimlo, Mûsa Anter, Celal Talabani û heza Samî Ebdurrehman ji ji awireke tecrûbeya şexsî bi bîra me dixe. Em bi Mîrhem Yigit re peyivîn, li ser wê dema bi arîşe û nakokî ya di nava endamên KSSE'yê de, li ser sedema arîşeyê û qutbûna AKSA'yê ji KSSE'yê.

em dikarin cih li vir bidin we. Tu vê nexwazî li Ewropa dostên me pirr in, em dikarin ji we re cih weke penaber peyda bikin. Heke hûn şer ji bikin elaqê me ji we nîne, hûn zanin. Li vir li Ewropa vê şokeke mezin çêkir. Xwendekar bûn du alî. Ji sedî 70 ta 80'yê xwendekaran li dijî Barzanî bûn. Te dît ew teslîmbûna wî û rojname, meqale û tiştên li ser vê şikestinê, tesîra xwe dikir li ser xwendekaran. Di kongreya li

Berlinê de ez nû hatibûm Swêdê. Em pênc kes ji Swêdê çûn kongreyê. Li kongreyê minaqeseyeke mezin li ser şoreşê û Barzaniyan çêbû. Pirraniya xwendekaran - weke min gotî, ji sedî 70'yê xwendekaran - derketin û li cihekî din kongreya xwe kirin. Sala piştê, 1976'an di kongreya li Frankfurtê de êdî Komeleya Xwendekarên Kurdistan li Derveyî Welat çêkirin, jê re AKSA\*\* dibêjin. Komeleya din, jê re dibêjin KSSE. Êdî piştê me di nav wê komele de kar kir li Swêdê. Me berpirsiyariya kovara wê Aso\*\*\* ji kir. Kovar li Swêdê derdiket, lê ya Ewropa giştî bû. Ez sala 1978'an havînî vegeyriyam welat û du salan mam. Te dît ez payîza sala 1969'an çûbûm Çekoslovakayê bi bursa Apê Mûsa. Hinek merivantiya me ji hebû. Min û zarokê Apê Mûsa, Dicle û biraziyên wî Suleyman û Seyidxan Anter [Anter] li Mêrdînê me bi hev re dixwend. Me hev nas dikir. Em heval bûn. Di warê siyasî de ji hişyarbûneke me hebû. Me xwe nas dikir, hinek haya me ji dîrok û rewşa Kurdan hebû. Li Stenbolê ez li mala wan dimam. Min pasaporta xwe li Stenbolê derxist û ez derketim. Rê belkî du mehan dirêj kir. Ez li Sofya mam. Li Sofya min vîza Çekoslovakayê xwest. Vîze dereng dan. Hingê têkiliya min bi xwendekarên Kurd li Ewropayê (KSSE) re çêbû. Fewziyê Mala Esed ji Kurdên kevin bû li Sofiyayê. Mûsa Anter navnişana wî dabû min. Qederê du mehan ez li ba wî mam. Piştê min vîze girt, derbasê Çekoslovakayê bûm.

Gava ez li Sofiyayê bûm, kongreya KSSE'yê hebû. Li wir jî em ketin kongreyê. Kemal Cengîz hebû, kurdekî ji DDKO'yê bû, em bi hev re ketin kongreyê. Me di kongreyê de tiştek [peyameke nivîskî] bi navê Xwendekarên Kurd ên Bakur da kongreyê. Têkiliya min her zû dest pê kiribû bi komele û xwendekaran re.

## Li Pragê te çi kir?

Li Çekoslovakayê em çûn kursa zimên. Çekoslovakayê burs dida xwendekarên cihana sêyem. Zanîngeha min lê xwend, 17'ê Lîstopada, berê wê li cihana sêyem bû. Îdeolojîk bûn. Dixwestin xwendekarên cihana sêyem li cem wan bixwinin, têkiliya wan bi sosyalîzm û marksîzmê re çêbe.

Zanîngehên bi vî şiklî li Rûsya û Bulxaristanê jî hebûn. Me nêzîkî 9 mehan ziman xwend. Em li cihekî diman, weke qesrekê bû. Qesreke aristokratekî bû, sosyalîzmê dest danibû ser. Xwendekar ji Efrîka û Viyetnamê pirr bûn.

Hingê musabeqeyekê li ser Partiya Komünist a Çekoslovakayê dest pê kir û du kategorî xwendekar hebûn. Yek jê yêd ku lîse qedandibûn. Kategorîya din jî zanîngeh qedandibûn wê doktora bikirana. Di kategorîya kesên lîse qedandî de ez bûm yê yekê. Bi merasîmeke mezin, berpirsê Partiya Komünist ê Rojhilata Navîn hat wê dê, xelatên me dan me. Ala ciwanên Çekoslovakya û her wekî din. Ez bûm, Zagrosê Mala Haco hebû, Maîn hebû Kurdekî ji Şamê bû. Ew ji mala Hemo Leyla bû, ew malbat di dema Selehadîn Eyûbî wan de li Şamê maye. Pirr neteweyî bû. Netewetiya Maîn jî hişk bû, ewqasî ji Ereban aciz bû. Lewhe hebûn li wir, me jî sûretên ji Kurdistanê, karpostal li wir datanin. Îca carekê, Maîn hat got, "Yekî Ereba wî malzemeyê me li ser lewhê radike, ez ê lêxim." Her got, wî digot, ez ê lêxim, ji bo ku wî sakîn bikim, ti pirs-girêk çênebin, min digot, "Te dît ku rahiştîyê", digot, "Na". Dawî me nehişt, wîlo. Piştê em çûn unîversîteyê, min Zanistên Cîvakî û Siyasî xwendin. Li zanîngeha me her du salên pêşî miştêrek bûn, sala sisiyan jî te branşek dineqand. Min sosyolojî hilbijart. Min sala sisiyan qedand. Jixwe sala çaran havînê ez çûm Swêdê, ji bo serekî.

## Ew çawa çêbû?

Ez bi otosotpê hatim. Ez û hevalekî xwe yê ji Qibrîsê bûn. Potos Fosporîs. Aliyê dijberê dewleta Tirk, hevaltiyêke me ya xurt çêkiribû. Em demekê bi rê de çûn, kesî em ranekirin. Em di gundekî re derbas bûn, me bisiklê li wir dit. Me rahiştîyê, em lê siwar bûn. Geh min dajot, ew li pey min û geh wî dajot ez li pey wî. Îca hejmara Kurdên çalak kêmbû, belkî panzdeh bîst bûn. Kurdên parçeyan gişan bûn.

## Tu bi xwe di demeke dîroka KSSE û AKSA'yê de cih digirî, wan çi dikir?

Sala 1956'an Komeleya Xwendevanên Kurd li bajarê Wiesbadenê Elmanyayê hat damezrandin\*. Wê demê Kurd pirr tinebûn. Dr. Ebdurehman Qasimlo ew hebûn, hinek Kurdên me ji Rojavayê Kurdîstanê, ji Rojhilatê Kurdîstanê hebûn. Wan ev komele damezirand. Piştê jî şax û şûbên vê komeleyê li gelek welatên Ewropayê çêbûn. Mesela, sala 1970'yî kongreya Stockholmê çêbû. Ez wê wextê li Çekoslovakayê, li Pragê bûm. Ez jî çûm kongreyê. 150 delege ji her aliyê Ewropayê hatibûn. Kongreyê jî weke gerdîşekê, weke rêûresmekê 5 rojan dikişand. Hin îstîsna ne tê de, salê carekê kongre çêdibû. Hema bibêje piştî 70'yî ez ketim kongreyan gişan. Kongreya 1972'yan a li Bukreşê a li Romanyayê. Kongreyên 73 û 75'an li Elmanyayê li Berlinê bûn. Di kongreya 75'an de Komeleya Xwendekarên Kurd li Ewropayê parçe bû. Ji ber ku wê wextê li Başûr piştî Peymana Cezairê şoreşa Barzanî şikest. Tesîra wê li ser Kurdên Ewropayê zêde çêbû.

## Tesîreke çawa?

Hingê Barzanî diçe cem Şahê Îranê û şah sê alter-natifan datîne ber wî: Tu û hejmareke tu diyar bikî,

Lê gava ez hatim, li vir çend kategori Kurd hebûn. Yer zarokên mala Enter hebûn. Bedirxan, Silêman Enter in. Baksî ew pašê 1973-74'an hatin.

Grûba ewilî Kurdên Başûr bûn. Sê çar Kurdên Başûr salên 62-63'yan li Stenbolê dixwendin. Celal Elemdar, İbrahim Mam Xidir ew in. Li Stenbolê têkiliyê didin wan ku Komeleya Xwendekarên Kurd li Ewropayê heye. Têkiliya wan bi Mûsa Anter re jî heye. Li wir li Stenbolê tèn girtin. Demekê di zindanê de dimînin. Ku derdikevin, îca tèn Swêdê. Ji yên siyasî, ew yên ewilî ne. Lê Kurdên din pašê bi komikî hatin û zêde bûn. Yên mala Enter, 67'ê hatin. Piştê zêde bûn. Ji salên 70'yî û berjor de êdî hejmara Kurdên li Swêdê zêde bû.

Necmettin Buyukkaya û Omer Çetin jî li vir, li Swêdê bûn. Evana, ew problema Şivan wan çêbû, ew kuştina li Başûrê Kurdistanê çêbû. Ew hingê li wir bûn. Ew piştê di ser Sûriyê re derketin, hatin Çekoslovakya cem me. Em demekê bi hev re man. Me li Pragê gelekî li ber da ku wan li wir bi şiklekî bi cih bikin. Lê hikûmetê destûra iqametê neda. Di nav xwe de em xebitîn, me hinek îmkân jî wan re çêkirin. Me ew şandin Swêdê. Li Swêdê qebûl bûn, ew jî li vir bûn.

Reşo Zilan li vir bû. Ev Kurdên kevin bûn. Piştê zêde bûn, Hanefî Ceblebî, Keya İzol, Salih İnce, Mahmût Baksî û pîr kesên din hatin.

İca hevalên li vir xwestin ez bê cem wan; ew çend hevalên mala Enter. Me rabû xebateke perwerdeyê da destpêkirin, kitêbeke [Georges] Politzer li ser felsefeyê hebû, me bi hev re hinekî xwend. Ji ber ku ji xwendinê re hinekî jîr bûm, hinekî wilo alîkariya min çêbû. Êdî gotin, çima tu nayê vir?

Min jî got, tamam. Gava em derketin, te dît, aliyê siyasî jî me re esas bû. Ji xwendinê zêdetir, em ê di nav Kurdan de, di nava Komeleya Xwendekarên Kurd de kar bikin. Dîtinên idealist jî hebekî hebû. Me digot, ew Ewropî Kurdan nas nakin, em ê biçin jî wan re hinekî behsa Kurdan bikin, halbûkî ne wilo bû, Ewropîyan jî me baştir zanibû.

### Li Swêdê karê te di nava Komeleya Xwendekarên Kurd de dewam kir?

Em hatin vir, li vir jî em ketin nav xebata KSSE'yê û pašê piştî ku komele bû du parçe, di nav AKSA'yê de ez ketim rêveberiya Ewropa. Ez bûm redaktorê kovara Aso. Me ew li vir derdixist. Di ber wê re me kovareke din jî derxist, "Em çi bikin". Hinekî komeke marksîst bû.

Vêca çi kongreya xwendekarên çêdibû, ez beşdar dibûm. Ji wan didu girîng in. Yek jê kongreya li Stockholmê ya 1970'yî bû. Dr. Ebdurehman Qasimlo li wir bû. Kurdên Libnanê hatibûn. Hinek ji PDK-Iraqê hatibûn, weke Mihemed Hebib Kerim, endamê polîtbiroya partiyê bû. Ya din, kongreya 72'yan a li Bukreş, li Romanyayê bû. Kongreyeke enteresan bû. Heyeteke pîr fereh ji Başûrê Kurdistanê hatibû. Dara Tewfiq endamê polîtbiroya Barzanî hebû, Samî Ebdurehman hebû. Seroka Jinên Kurdistanê jê re Xwişka Zekiye digotin, ew hebû. Û Adil Murad hatibû, ew jî serokê xwendekarên Kurd bû li Bexdayê. Ew otonomiya li Başûrê Kurdistanê çêbûbû, li derve jî derfet û îmkânêk çêkiribû. Mesela mesrefên kongreya li Bukreşê ya 7 rojan, rêveberiya Çavuşesko dan. Hotel, xwarin mesref hemû wan dan.

### Kongreya beriya wê ya Stockholmê mijara esasî çi bû?

Di kongreya Stockholmê de 5-6 meh di ser peymanê 11'ê Adarê ya otonomiyê re derbas bûbûn. Ew di bin atmosfera serketinê de li dar ket. Êdî kongre jî zêdetir li ser wê bû. Em bibêjin, kar û xebata li derve dikare çawa be, organa komeleyê Kovara Kurdistan bû, ew çawa dikare çêtir derve, têkilî, danûstandin li Swêdê bi kesayetiyên Swêdî re çawa bîn bipêxistin, ew pirs mijar bûn. Di bin wê bandorê de hejmara



kum û komiteyên piştgiyariya Kurdan çêbûn.

Di kongreya li Bukreşê de rewş çihê bû. Li wir minaqeşeyeke mezin li ser têkiliyên bi Îranê re çêbûn. Şoreşa Başûrê Kurdistanê bi Îranê re gelekî hatibû girêdan. Ketibû bin kontrola Îranê. İca xwendekarên hişyar, nexasim ên ji Rojhilatê Kurdistanê, tim û tim bal dikişandin ser wê têkiliya zêde bi pêşketiye, ewqasî ku êdî bûye eleyhê Şoreşa Rojhilatê Kurdistanê. Heta di 1967'an wan de Silêman Muînî, ku ew jî ji şoreşgerên Rojhilatê Kurdistanê bû, jî aliyê PDK-Iraqê, Barzanî ve hat kuştin û laşê wî teslimî Îranê kirin. Ev bûbû sedem ku hejmara xwendekar û ez jî di nava wan de bûm, em bibin muxalîfê tevgera Barzanî. Ji bo me pîr giran bû, ne ya qebûlê bû ku tevgera siyasî ya parçeyekî, li çûna alîkariya tevgera siyasî ya parçeyekî din bike, rabe û serok, kesayet, kadroyên wan bigire, bikuje, teslimî dijmin bike. Tesîra wê pîr xirab bû. Weke niha çawa şerê li Başûr, em bêjin, PDK, malbata Barzanî hevkarîyê dike ji dewleta Tirk re. Wî çaxî jî bi Şahê Îranê re bû. Hingê weke niha eşkere nedikirin.

### Çawa wê dubendiyê dest pê kir?

Çaxê ez li Pragê, Şahê Îranê çend kes idam kiribûn, me jî li dijî wê îdamê li Pragê, li Çekoslovakayê belavokê derxistibû. Ew beyan di kongreyê de bû problemeke cidî. Minaqeşeyeke mezin li ser bû. Gotin, çawa hûn dikarin li dijî Îranê, ku ewqasî dostê me ye belavokê binivîsin. İca Samî Ebdurehman rabû axivî, got, "Em bi ti şiklî qebûl nakin ku şûbeyek ji yên KSSE'yê li dijî Şahê Îranê tişteki bêje. Ji ber ku Şahê Îranê du meh sê mehan alîkariya xwe jî ser me bi-birre, şoreşa me wê hilweşe." Ev jî jî bo xwendekarên Kurdistanê şokek bû. Çawa şoreşek ewqasî bi dagirkerî re, bi dijiminekî re bê girêdan. Jixwe, wilo jî bû.

Kongreya 73'yê li Berlinê bû. Li wir dijayetiya li hember Barzanî zêde bû. Li wir nexweşiyêke mezin derket. Aliyê Barzanî pîr agresîf bû. Nedihiştin kes qise bike. Gelek kes jî kongreyê avêtin, jî ber ku li dijî Barzanî axivîn. Li ser wê meseleya hevkarîya bi şah wan re.

Jixwe, ê min, salên ez li Çekoslovakya mam, du tişt min zû nas kirin. Ji bo min jî di aliyê siyasî de bûn du bingeş ku heta îro jî bûn weke perspektîfê. Yek jê, min li Pragê sistema sovyetîk, reel sosyalîzma pîr burokratik nas kir. Mesela îmkânên rexnê hema hema tine bûn. Diktatoriyeke pîr hişk hebû. Bi taybetî, piştî 1968'an Sovyet bi tank û topan kete Çekoslovakayê, Partiya Komunîst a Çekoslovakayê ya hinekî reformxwaz, fetisandin û serokê partiyê Aleksander Dupçek jî sirgûnî Enqere kirin weke diplomat. Em xwendekar bûn. Em weke sosyalîst jî Kurdistanê derketin. Em bi xwendekarên li wir re dipeyvîn. Sempatîyêke me jî bo sosyalîzmê, jî bo reşikan hebû. Haya me jî Martin Luther King hebû. Piştî danûstandina bi mala

Enter wan re, zû têkiliya min bi kitêban re çêbûbû. Mesela di 67'an de li lîseyê em aboneyê kovara Ant bûn. Jiyana Che Guevara her hefte di Antê de derdike. Hefteya ewilî jî sûretêkî Guevara pê re dabûn. Min bi çarçove kiribû biribû malê. Bavê min digot, ev ki ye, min digot, şêxek e. Te dît bi rih jî bû.

### Ya din çi bû?

Sistema li Çekoslovakayê, esas li giş welatên Pakta Warşowê eynî bû. Li wan welatan, dikan û mexazên taybet hebûn. Bi tenê rayedarên Partiya Komunîst dikarin tiştan jê bikirin. Perê wê jî taybet bûn. Jê re tuzeks digotin. Xelkê jî ev didit, li ber çavên xelkê ev dibû. Mesela ewên Partiya Komunîst ên jor, derdiketin derveyî welat digeriyan, lê xelkê nekarî. Em û xwendekarên wan bi hev re bûn. Me dît ku ti têkiliya xwendekarên wan jî bi sosyalîzmê re nîne. Li wir hinekî bi rêya hin kesayetyan, em bi hinek muxalîfan hisiyân. Carinan tiştên welê ecêb jî çêdibûn. Du bira hebûn ji Efrînê. Vêca yekî ji wan digot, sosyalîzm, komunîzmeş e. Yê din jî digot, ez sosyalîzma tuzeks naxwazim, yê din jî digot, ez sosyalîzma tuzeks naxwazim.

Li aliyê din tişteki baş ku min li Pragê nas kir û li cem min her sal xurt bû, ew bû ku min tevgera Barzanî pîr zû nas kir. Min şexsê Barzanî bi xwe bi rêya Kurdên me yên Rojhilat. Malbata Mihemed heye, hingê li Uppsalayê, te dît hingê jî Hecî Ehedî, Dr. Ebdurehman Qasimlo hebûn [li Pragê]. Bi rêya wan, ez pê hisiyam ku Barzanî ne bi wî hawê ez difikirim e. Li cem me li Bakur di nav Kurdên şiyar de popularîteya Barzanî hebû. Lê salên 70'yî gava ez li Pragê bûm, hevalê me yên Rojhilatî jî min re behsa wê yekê kirin ka çawa hevkarîya Şahê Îranê dikir, meseleya kuştina Silêman Muînî, min jî wekî din tişt dîtin, weke aşbetalê. Axir min tevgera Barzanî nas kir.

### Te nas kir, çi guherî?

Li vir li Swêdê jî gava ku aşbetal bû. Kongreya me ya Swêdê hebû. Rapora siyasî di wê kongrê de min hazir kir û min xwend. Sala 1975'an bû. Nivîsa ewilî a li Ewropayê ya li dijî şoreşa Barzanî bû. Ev bû sebeb ku em jî bibin du parçe. Şerêkî nexweş qewimî. Êdî em li wir derketin, em çûn Berlinê û em bûn bingeşê komeleya nû AKSA'yê.

Mesele di 76'an de li Frankfurtê me kongre çêkir. Piştî kongreyê me komîteya koordînasyonê tenê jî bo Kurdên Bakur çêkir. Ez hebûm, Egîd hebû, Giyaseddin Sayan hebû, Kerem hebû demekê pîr çalak bû. Piştê çû.

Düvre me grûbeke Kurdistanî jî çar parçeyên Kurdistanê ava kir. Grûbeke sinoran nas nake, me digot, em jî Kurdistanê ne. Ew grûb bû, me komele bi dest xwe ve anî.

Ew û aliyê Barzanî hatin hember hev du. Lê grûba me pirr çalak bû. Me digot, divê teorî û pratîk ji hev ne qut be. Yanî gerek tu karibî semînerêkê jî bidî, gerek tu karibî afîşekê jî li diwaran bixî û di folklorê de jî hebî. Grûbek, dendikek gelekî xurt bû. Me bi xwe belavokên xwe derdixistin. Klaviya Çekî entresan e, 'Ç' ya Çekî, çinçalê wê li jor e.

Îca carinan çêdibû di ç'yên me bi yeke Çekî re dihatin bin hev. Me belavokên bi Kurdî derdixistin. Kurdiya min hê li malê hebû. Mesela min li gund kovara Çiya ya Hemreş Reşo - ji Apê Mûsa re dihat welat - dixwend. Hê ji helbesteke wê li bîra min e:

*Şam û London  
Berlîn û Tokyo, Stenbol pirr xweş in  
Lê sînorê Hekarî xweştir e  
Ger keç û xortên Kurdan bi hev e bizewicin pirr xweş e  
Lê bî yên neyar re jehra mar jê xweştir e. [Ne halê gotin bi gotin jiberkirî ye]*

Kêfa min ji Kurdbûnê re dihat. Îca bi Kurdî me dinivîsi. Tê bîra min li ser zindana Diyarbekir a 72'yan me belavokê nivîsi. Wê wextê, kovarên Çiya û Ronahî hebûn. Du rêxistinên Bakur hebûn, Hevra û Bahoz. Bahoz aliyê Hemreş Reşo û zarokên mala Enter wan bûn, paşê Reşo Zilan ji hat. Aliyê Hevra jî, Nizamettîn hebû, Kurdekî jî Serhedê bû. Paşê Kemal Burkay 72'yan hat Ewropa, ew jî bi wan re kar kir. Hinekî têkiliyên wî bi Kendal Nezan re jî hebûn. Kendal jî kovareke têra xwe xurt, Azadî jî 78'an heta 81'ê filan derxist.

Îca têkiliya min Kurdî re baş bû. Ew belavoka bi Kurdî tê bîra min, min nivîsand.

**Belavokê çi bela anîn serê komeleyê?**

Îca pîrsgirêkeke me ya cidî bi PDK'ê re çêbû. Ji ber ku me komele [şûbeya KSSE'yê] jî dest wan girt û li dijî Şah beyan didan. Me yeke din jî kir. Wezîrê karê derve yê Sûri destpêka 70'yî hatibû Pragê. Ebdulhelîm Xeddâm\*\*\*\* bû. Wî semîrek da. Em jî çûn semînera wî. Hevalê me Mihemed Emîn Zalza, li Cezaîrê konservatuwar qedandibû. Anîha li Başûrê Kurdistanê ye. Wî bi Erebi baş dizanî. Gava behsa Kembera Erebi kir, me jî broşûrek li ser nivîsandibû, 20-30 pel bûn, li Çekoslovakayê, te nikaribû çap bikî. Ez berpirsiyarê têkiliyên bi unîversîteyê re bûm. Diviyabû ku destûrê ji zanîngehê bistînim. Ji ber ku me zanibû wê qebûl nekî, me ew li Berlînê çap kir, hezar heb. Şevekê, me çend kesan ew li cihên telebeyan belav kirin. Dinya li bin guhê hev ket. Sûriyê mudaxele kir, got, li dijî me beyaneke evqasî hişk hatiye dayîn. Êdî unîversîte li aliyekî, li aliyê din jî nûnerên PDK'ê jî êdî li dijî me bûn. Wan a xwe kire yek û biryar dan ku komîteyê jî dest me derxin. Berpirsiyarê Partiya Komunîst beşdarî kongreyê kirin da ku jî dest me derxin. Li wir tam darbe li me kirin. PDK'ê û Partiya Komunîst a Çekoslovakayê darbe li dijî me kirin û tevî ku xelk bi me re bû, komîte jî dest me girtin. Yek jî sedemên em hatin Swêdê jî ew bû.

**PDK û Partiya Komunîst, ev çawa dibû?**

Têkiliyên PDK'ê bi Partiya Komunîst a Çekoslovakayê re gelekî baş bûn. Muhsîn Dizeyî konsolosê Iraqê bû, - bav yan jî apê Sefîn Dizeyî ye. Şeveke me çêbû, hat şeva me jî. Ulsera min hebû, ez li nexweşxaneyê bûm hefteyekê, hat serdana min, wiskiyek jî bi xwe re anibû ji personelê wê derê re.

Hate şeveke me jî, Kurdên ji Ermenistanê, malbata Celîl hatibûn. Şeveke xweş bû. Muhsîn jî hatibû wê şevê. Necmettîn Buyukkaya û Omer Çetîn jî li wir bûn. Li wir me hev nas kir. Muhsîn Kurd bû û têkiliyêke me hebû.

Îca wexta me beyana li dijî Sûri da, xeber giha Muhsîn jî. Ew nûnerê PDK'ê bû wî li ser navê wê bi Partiya

Komunîst a Çekoslovakayê re dida û distand. Ew ket eleyhê me. Bi rêya wî Partiya Komunîst jî ket eleyhê me. Grûba me jî pirr çalak bû. Konferans, belavok, broşur me hazir dikirin, em diçûn kongreyan.

Me xwest li ser Tirkîyeyê belavokekê derxin, zanîngehê qebûl nedikir, digot, têkiliyên Lenîn bi Mustafa Kemal re hene. Axir piştê, bi kongreyê komele jî me stendin.

Kurdên Feylî ne zêde bûn. Lê hikûmeta Iraqê salê 60'î, 70'î, 80'î Kurdên Feylî jî Bexdayê derxistin. Salên 70'yî sed hezar Kurdên Feylî jî Bexdayê derxistin. Hemû dibirin ser sînorê Iranê û diavêtin. Ji ber ku gelek jî wan bi şoreşê re bûn. Mesela Mihemed Hebîb Kerîm sekreterê Partiyê bû. Adil Murad, wextekî bû konsolosê Iraqê li Bukreşê.

**Ka em li kovara we Asoyê vegerin...**

Aso me li Uppsala hazir dikir, derdixist. Min dinivîsi, Seyîdxan Enter alîkarî dikir, Mihemed Muhtedî hebû, wî jî dinivîsi. Kerem hebû, piştê jî me dîr ket. Wî dinivîsi, Giyas dinivîsi. Qederê du salan me çend hejmar derxistin. Beriya ez vegerim welat, sala 1978'an, pîrsgirêkên me di nava komê de jî hebûn. Kovara me ya komeke radikal a marksîst bû. Karîkaturekî Lenîn hebû, kureya dinyayê heye, Lenîn jî rahiştiye melkes û qirêja kapitalîzmê jî dinyayê dimale. Îca yekî dogmatîk ê DDKO'yê hat, got, mirovekî weke Lenîn, we çawa melkes daye dest? Min got, kuro me melkes ne daye dest, ew karîkaturekî di wextê Lenîn de bû.

**► Me Mam Celal li kongreya Berlînê ya 75'an dît. Hingî ma ne, min got, komele bû du parçe. Li wê derê kesayetên Kurd zehf bûn. Kemal Fuad bû, Dr. Şiyar ê bi Şivan wan re bû, gelek Kurdên li Elmanyayê kevin ên wek Sertaç Bucak ew, Kurdên Rojava mesela Mistefa Reşîd, Hiseynê Kîkî, Baha hebûn.**

Axir, Aso çend hejmarên baş derketin. Aso ya AK-SA'yê bû. Kurdistan salê carekê derdiket ew jî ya KSSE'yê bû. Min pêlekê li ser dîroka komele semîner dan.

**Li Pragê jî Rojhilat kî hebû?**

Min û Hecî Ehmedî baş hev nas dikir. Li Çekoslovakayê Kurdên Rojhilat ne zêde bûn. Hecî Ehmedî bû, Dr. Ebdurehman Qasimlo hebû, carinan Selîm Baban dihat û diçû, ew li Elmanyayê dima, carinan Emîrê Qazî, Mihemed Muhtedî li wir bû.

Qasimlo li zanîngeha aborîyê ders didan. Wî wextê organa Hizba Demokrat, Kurdistan jî li wir derdixist. Gelek caran endamên serkirdayetîya Hizba Demokrat dihatin Pragê, civînên xwe di dikirin. Doktor jî li Pragê çalak bû. Di Newrozana Kurd ileh dihatin cem hev. Li rojhilatê Ewropayê Malên Çandê hebûn. Mirov dikaribû civînên xwe li wan çêke. Klûbek hebû, jê re digotin, Klûba Dostayetîyê. Me civînên xwe li wir çêdikirin. Ku wexta wî çêdibû ew jî dihat civînên me. Doktor nas kirî bû. Wî kitêbeka berferêh li ser Kurdistanê jî nivîsandibû. Dr. Qasimlo diçû Bexdayê jî. Te dît, têkiliya wî bi Bexdê re baş bû. Intelktuel bû. Hevala wî Çekoslovak bû.

**Te Mam Celal kengî nas kir?**

Me Mam Celal li kongreya Berlînê ya 75'an dît. Hingî ma ne, min got, komele bû du parçe. Li wê derê kesayetên Kurd zehf bûn. Kemal Fuad bû, Dr. Şiyar ê bi Şivan wan re bû, gelek Kurdên li Elmanyayê kevin ên wek Sertaç Bucak ew, Kurdên Rojava mesela Mistefa Reşîd, Hiseynê Kîkî, Baha hebûn.

\* Behsa KSSE (Kurdish Students Society in Europe) 'yê dike.  
\*\* The Association of Kurdistan Students Abroad.  
\*\*\* Navenda wê li bajarê Swêdê Uppsalayê bû. Kovar, sala 1977'yan dest bi weşanê kir.  
\*\*\*\* Piştî mirina Hafîz Esed heta 2005'an weke Suniyê herî payebilind di nava Beesa Sûri de ma. 2005'an jî wezîfeyên xwe û Beesê istîfa kir û heman salê li Fransayê bû penaber. Demeke dirêj jî bo rûxandina Beşar Esed şixulî, lê 2016'an şikestina xwe qebûl kir. Dawiya Adara 2020'an li Parisê dilê wî sekinî û mir.  
\*\*\*\*\* PKK hîna nehatiye damezrandin û Mîrhem Yîgît grûba ku de wê damezirîne jî nas nake. Tenê helwêsta Necmettîn Buyukkaya dişibîne ya PKK'iyên destpêkê.





## Turkum dogruyum nekir didu

Destpêka çalakbûna Mîrhem Yigit di salên xwendina lîseyê û di wexta mamostetiya bi wekil de ye: "Kurdên Rojava, Hîseyne Mala Cum'a hebû. Havinê dihat li ser sinor, Kurd birêxistin dikirin. Wan ji em şiyar dikirin. Em jê piçûktir bûn. Ew xwendekarê zaningehê bû, zane bû, tégîhiştî bû. Îca aqlê wî ji min dibirî. Îca wî ji min re got, 67'an mîtinga ewilî 13'ê Tebaxê li Farqînê çêdibe, ew Dogu Mîtingê. Got, karê min heye, ez nikarim, tu karibî here. Min hingê lîse dîxwend. Min jî got, tamam. Îca min jî dê û bavê xwe re negot. Ez çûm min jî dê û bavê xwe re negot. Ez çûm Diyarbekir, ji wir jî li Qemyonekê siwar bûm û ez çûm Farqînê. Perê min jî 2 weraqê û niv filan bûn.

Ez bawer dikim bêhtirî 10 hezar kesan hebûn. Meydana nek hebû, dagirtî bû. Ji her alî ve Kurd hebûn. Yê Şîçî Partîsî (TÎP), Seid Elçî li wir bû, axivî. Yekî dirêjî, esmerî, wilo xûz bû. Her kes çû, got, pîroz be. Ez jî zarok bûm, kesî ez nas nedikirim, min jî xwe xist nav wan, min ew pîroz kir. Li wir Newzat Nas hebû. Coş û heyecaneke mezin hebû.

1969'an mîtingeke din çêbû, Mîtinga Parastina Nîzama Destûrî. Ew jî gelekî qelebalix bû. Heman salê, min li gundekî cîranê me, li Nîsêbinê mamostetiya bi wekiltî kir. Piştî mîtingê ez bûm agir.

Wexta min dest bi dersdanê kir, te dît ez îdealîst bûm. Ez ê dersê bîdim zarokên Kurdan. Lê gava me rojxêra hev kir, dest pê kirin "Turkum dogruyum... [destpêka ehda li dibistanên Tirkîyeyê ya ku bi ez Tirk im, rast im... destpê dîke]". Ez şikestim. Min got, çawa ez her roj bêm û zarokên Kurdan bibêjin, Turkum dogruyum. ez pîr fikirim. Wê şevê belkî ez heta sibehê bi xew ve neçûm.

Axir min formulek dît. Min fêmkir kir, gava ez bi Tirkî rojxêra wan dikim, dibêjim Gunaydin, weke mirov pê li pişkokê bike, zarok otomatîk dibêjin Turkum dogruyum. Min jî got, ez ketim hundir, ez ê bêjim rûnin. Bawer bike, min nekîr du roj. Min ew Turkum dogruyum rakir. Hevalê min mudîr bû, Haydar Duman jî Xarpêtê bû. Wî li tenîsta min digot, Turkum dogruyum."

## Li ser Necmettin Buyukkaya

### Destpêka salên

1980'yî yan jî hê 79 filan bû. Nû ji Rojhilat hatibû. Min ew vê carê li Diyarbekirê dît. Li mala wî li Ofîsê, em çend saetan rûniştin. Li wir wî behsa Rojhilat kir. Neco, te dît, mîlîtan bû, bi sedan bi hezaran çek, carinan bi kamyonan derbasî Rojhilatê Kurdistanê dikirin.

Mîrhem Yigit Necmettin Buyukkaya li Pragê, li mala xwe kiriye mêvan, û paşê li Swêd û Kurdistanê jî dibîne: "Necmedin Buyukkaya di bibîranînan xwe de jî behs dîke ku hatiye ba min. Necmedin û Omer Çetin bi hev re hatin. Yan jî hema li pey hev hatin. Demekê li oda min bi xwe razan. Omer henekoyî bû, Neco jî wilo mîlîtan bû, civakî bû. Di wê kongreyê [ya KSSE ya 1975'an li Berlinê] de ye ku bi fikr û mîlîtanîya xwe nêzi PKK'ê\*\*\*\*\* bû. Dr. Şivan jî wilo bû, proto PKK bû. Îca Necmedin demekê li cem me ma. Me ew şandin Swêdê. Gava ku ez hatim Swêdê, Neco jî Omer Çetin jî bi efûwa Ecewit re 1974'an veşeriyarî Kurdistanê. Destpêka salên 1980'yî yan jî hê 79 filan bû. Nû ji Rojhilat hatibû. Min ew vê carê li Diyarbekirê dît. Li mala wî li Ofîsê, em çend saetan rûniştin. Li wir wî behsa Rojhilat kir. Neco, te dît, mîlîtan bû, bi sedan bi hezaran çek, carinan bi kamyonan derbasî Rojhilatê Kurdistanê dikirin. Şoreşgeriya Neco, dişîbiya ya bajêr. Necmedin carekê te girtin, hingê heşt nasname pê re ne. Pîrralî bû, dikarî li gorîstanê razê, carinan here cihekî gelekî modern, dikarî danseke modern jî bike. Pîrr heyf bû Neco. Peykerê Necmedin li Başûrê çekirin. Piştî ku ez binxet bûm 80'yî min ew nedît. Heyf bû, di temenekî ciwan de çû\*." Wî rê didît. Kesekî jîr bû di meseleyên ger û tebdîlî qiyafet de."

\* Nîsana 1982'yan hat girtin û 22'yê Çileyê 1984'an bi êşkencê li zindana Amedê hat şehîdkirin

## Kurdên Swêdê yên pêşî

Mîrhem Yigit, beriya behsa Kurdên ku di dema xwe de ew dîtîne bike, behsa Kurdên pêşî çûne Swêdê dîke: "Kurdên Swêdê ji esas, Kurdê ewilî 1893'yan tê Swêdê. Navê wî Mîrza Seid e. Bavê wî jî Bakur e, ew li Rojhilatê Kurdistanê jî dayik dibe. Paşê dihere Hemedanê. Li wir hineke mîsyoner nas dîke, bi keça mîsyonerekî re dizewice û dût re mîsyonerekî Swêdî jî nas dîke. Ew wî dawetî Swêdê dîke. Tê sê mehan li Swêdê dimîne.

Kurdê diduya yê tê vê derê, Şerîf Paşa bû. Konsolosê dewleta Osmanî. Ew nezîkê heft heşt salan dimîne.

Kurda sêyem Leyla Bedirxan e, weke balerîn te vir.

Kurdên din, di sala 1947'an de xwendevanek e. Paşnavê wî Rastgeldî ye ji Rihayê wan e. Û piştî 60'î, komikên Kurdên Anadolê tîn. 65'an malbatên Kurdên Anadolê tîn. Piştî 70'yî jî ber darbeya 12'ê Adarê, bi dût de 12'ê Îlona 1980'yî, darbeya Evren, hejmara Kurdên bakur, pîr zêde dibe."

## Li ser aşbetalê bibîranînek

Mîrhem Yigit behsa serpêhatiyekê dîke, ka rojnamevanekî Swêdî rewşa Barzaniyan, ji wan çetir çawa dîtîye: "Destpêka 75'an wexta ez hatim Swêdê, rojnamevanekî Swêdî, Îngmar Karlsson [ne diplomatê bi heman navî] çûbû, li Kurdistanê geriyabû. Çûbû Rojhilat, Başûrê Kurdistanê. Li vir Ehmed Şexmûs hebû, yek jî Kurdên kevîn ê Swêdê ye. Ehmed Şexmûs jî me re got, "Ev rojnamevan dostê min e. Heger hûn bixwazin, salonekê bigirin, bila bê jî me re behsa gera xwe bike." Me got, tamam. Wê wextê jî navenda xebatê Stockholm û Uppsala bûn. Uppsala jî Stockholmê xurttir bû. Em li wir bûn. Em çalak bûn. Çend kesên li vir [Stockholm] bûn, me henek dikirin, me digot, hûn burokratên Stockholmê ne. Me li Uppsalayê salonek girt, hatin. Karlsson rabû, pîramidek çêkir, li serê wê Barzanî danî û tîrek kişand Tehranê. Got, xelk li vir bi Barzanî re ye, Barzanî jî di bin destê Tehranê de ye. Her kes aciz bû. Wî got, min ew dîtîye. Tîsta min dîtîye, ev e. Bi rastî jî sê çar hevdî der gotînan Karlsson re bihurîn, paşê di 6'ê Adarê de şoreş hilweşiya."



## Li ser Mûsa Anter

Mîrhem Yigit du caran beriya bibe xwendekar li mala Mûsa Anter mabû. Ew wiha behsa hevdi-tina xwe û Mûsa Anter a hingê dîke: "Ez du caran li mala Apê Mûsa mam. Carekê gava ketim îmîthanên zanîngê û carekê jî çawa min got, gava jî bo pasaportê derxîm. Apê Mûsa têkiliyên wî bi çar parçeyên Kurdistanê re hebûn. Bi rêya wan têkiliyan piyeseke wî hebû. Birîna Reş, ew wergerandin zimanên din ên weke Elmanî. Dema ku ji Ewropayê hinek dihatin, wan muheqqeq rêya xwe bi Apê Mûsa dixist, weke kesê pîspor.

Îca tam nayê bîra min, 86 e, 87 e. Rojnamevanekî Ewropî tî, pê re roportajekê dîke. Îca Apê Mûsa jî gelekî bi cesaret diaxivî. Rojnamevanê Ewropî dipirse, tu natirî tu van gotinan dikî, ew dibêje, na, li piştî min çiyayên me hene. Roportajêke pê re di Bêrxwedanê de derket. Min ew têkîlî danibû.

Kovar jê re dihatin, weke kovara Çiya ya Hemrêş Reşo. Hemrêş Reşo, yek jî wan kesan bû ku destpêka salên 60'î derketiye [ji Tirkîyeyê penaberî Ewropayê bûye]. Ew jî Kexta ye. Beriya ku derveke, haya wî û Apê Osman [Osman Sebrî] jî hev heye. Ji ber ku Apê Osman carinan meqale jî wî re dişandin. Ji Apê Mûsa wan re jî dişandin. Mesela Bariş Duniyasi hebû, ew kovarên 62-3-5 derketin, Dicle Kaynagi û hejmarek kovar derketin, nivîsên Apê Osman jî wan re jî dihatin. Nivîsên Nureddin Dêrsimî jî ne bi navê wî digihîştin.

Çavkaniyeke din jî, ew xwendekarên salên 60'î li Stenbolê xwendin, hemû li cem Apê Mûsa bûn. Ji Amûdê, Dêrikê, Efrînê, Hesekê, Silêmanî û Kerkûkê bûn. Ji Rojhilatê Kurdistanê bûn.

Cesareta wî ya medenî gelek bû. Mizaha wî xurt bû. Insanên hemberî xwe pîr şermezar dikirin. Carekê li Mêrdînê li Tugayê hatiye girtin. Sûbayekî xwestiye henekê xwe pê bike. Ji esker re dibêje, herin Mûsa bînin. Dibêje, 'Mûsa xelk behsa te dîke, xwedê giravî tu bi tîştî miştan dizanî. Li gora din insan jî Adem û Hawa ye. Lê gava tu li Darwin binêrî, ew qebûl nake, dibêje, insan jî meymûnê filan çêbûne, tu dibêji çî?' Ew jî dibêje, 'Gava em binîhêrin li van tiştên insan tînin serê hev du, serê hev jê dîkin, hev du dikujin, hingê teoriya Darwin bêhtir maqûl dibe.'

Wî stareke xwendekarî vekiribû. Gelek insanên weke birayê Îlan Selçûk, gelek ewên karîkaturîst, derdoreke wî ya pîr fereh hebû. Carekê li mala wî, kereng jê re hatibûn. Min û wî me kereng çik dikirin, saetekê jî min re behsa vitamîna C kir. Dinyaya wî pîr fereh bû. Vê têkiliya wî ya fereh imkanên bûrsan jê re çêkirin. Wî hejmarek xwendekar şandin. Yek li wir heye, Memo Yetkîn. Ew jî sê bîra ne. Apê Mûsa yek jî wan birayan bi xwe jî bi bursandibû. Biraziye xwe jî şandin. Ez jî yek jî bursiyerên wî bûm."

► Xwediyê kurtefilmê Çek: Kesê hêvî nedikir, kesê bawerî nedida û alîkarî nedida min. Her kesê kenê xwe dikir, lê xeyalek min hebû, armançek min hebû, min ew xeyala xwe bi ser xist. Bila Kurd Çekê ne ji bo bostek ax û hevdu kuştinê bikar bînin, bila Kurd Çekê ji bo rizgarkirina hemû axa Kurdistanê bikar bînin. Li dijî dijminê xwe bikar bînin, ne li dijî hevûdu.



## Mexmûriyê li Emerîkayê bûyî yekem:

# Çek

► IDRIS KARA

**K**urtefilma Çek li 43 festîvalên navneteweyî ve hat hilbijartin ji bo bê nişandan, di 6 festîvalan de dibe yekem û di gelekane de diçe finalê û xelata rûmetê ji werdigire. Aliyekî xas ê vê kurtefilmê ewe ku derhîner û çêkerê filmê ji xelkê wargeha penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî ya Mexmûrê ye. Wî di nava derfetên kêr û gelek caran tine de, ava kir. Tevî hemû astengîyan wî hewl da, û di dawiyê karî li Emerîkayê û gelek welatên din ên cîhanê xelatan wergire.

Mamosta Sedîq Mijîni\* Sedîq li wargeha penaberan ya Şehîd Rûstem Cûdî Mexmûrê dimîne û dibistana amadeyî jî li wir temam dike, dema ku dixwend ti zanîngehê jî bo wan nebû. Piştî dibistana amadeyî jî ber ku di mal de kesê mezin ew e, xwedî berpirsariyê û mecbûrî di şirketan de kar dikir. Sedîq gelekî dixwest biçe zanîngehê, lê ji ber ku di temenê piçûk de hatibû zewicandin, wî nekarî.

Sedîq piştî demekê kar dike, li wargehê mamoste lazim bûn, ji bo wê jî miracaet kir û sala 2006'an bû mamoste. Lê xeyala wî ne ew bû, wî dixwest biçe zanîngehê û beşa sinemayê bixwîne.

### Kurtefilma 'Çek'

Serpêhatiya Sedîq Mijîni bi kok û şax e. Ji ber ku ew penaber bû, derfetan rê nedida ew baş bi karê hûnerî xerîk bibe.

Sedîq Mijîni behsa cara yekem mereqa xwe ya ji bo sinemayê dike û dibêje, dema ew li gund bû, rojekê di televîzyonê de li filmêkê temaşe kiriye û wê filmê gelekî bala wî kêşaye. Sedîq wê demê 7 salî bû û biryar da ku ew jî rojekê filmêkê çêke. Ji xwe re digot, çawa xelk dikarin filman çêkin û listîkvan hebin. Wê rojê Sedîq biryara xwe dabû. Ji xwe bi xwe jî dibêje, "Heger min zanîngeh xwendiba, minê

beşa sinemayê xwendiba, ew xeyala min bû." Lê nekarî biçe zanîngehê. Hevalên wî ên ku diçûn zanîngehê hebûn, her tim diçûn gel wan û ji wan dipirsi ka sinema çawa tê çêkirin.

Sedîq biryara xwe dabû ku kurtefilmêkê çêke, lê wê çawa çêke, qet pê nedizani. Sedîq çawa dest bi girtina dîmenên filmê dike, zorî û zehmetê tên pêşiyê.

### Serpêhatiya girtina dîmenan

Dema Sedîq biryar da kurtefilma Çek çêke, her tim di nava lêgerîn û lêkolînan de bû. Hevalên wî yê ku beşa sinemayê dixwendin, hebûn. Ew diçû gel wan û digot, "Xeyalek min heye, dixwazim kurte filmêkê çêkim." Lê kesî berê xwe nedida Sedîq, xemsar bûn û ti hêviyek nebû.

Sedîq bi biryar bû, got, "Divê ez li astengîyan nesekinim." Sedîq li ser sinemayê bi tiştêkî nedizani, kesî jî alîkarî nedida wî, ji ber wê jî ew bi xwe fêr bû. Belge û nivîsên li ser sinemayê kom kirin, xwendin û xwe fêr kir.

Sedîq Mijîni di heman demê de mamoste jî bû, belê li saziya Çand û Huner jî kar dikir. Li wir xebatên ji bo huner hebûn, kesî ew hîn nedikirin, wan bi xwe xwe fêr dikir. Bi hewldanên xwe li wir perwerde dibûn. Li saziyê destpêkê hinek kurtefilm hatin çêkirin, mereqa wî jî ew bû, dixwest fêr bibe.

Piştî lêkolînan xwe temam kirin, êdî dest bi nivîsandina senaryoya xwe dike. Sedîq Mijîni wê demê biryarê dide ku li ser "çêkê" kurtefilmêkê çêke. Sedîq dixwest bi temaşevanan bide zanin, bê ka "çek" jî bo çi tê bikaranîn. Çek jî bo Kurdan çi ye, gelo çek tenê ji bo kuştinê ye, yan jî ji hev du kuştinê ye. Sedîq dixwest di kurtefilma xwe de girîngî û xirabîya çêkê bide pêş. Bi xwe jî dibêje, ji bo çi Kurd li ser bostek ax, hev û du dikujin, bila ji bo axa xwe hemûyî, çêkê li dijî dijmin bi kar bînin.

Sedîq dema senaryoya xwe dinivîsîne, vê carê

xwest bêhtir bibe xwedî tecrûbe, ji bo wê jî sala 2019'an çû Şengalê û li wir tevî xebatên sinemayê dibe. Li wir jî gelek tiştan hîn dibe, vê zêdetir bawerî da Sedîq, ji ber ku armançek wî hebû, xeyalek wî hebû. Sedîq piştî ji Şengalê vedigere, senaryoya xwe pêşkêşî Navenda Çand û Huner a Mexmûrê dike, ji wan re dibêje, "Dixwazim li ser çêkê kurtefilmêkê çêkim."

### Li zehmetî û astegîyan neseknî

Sedîq di Tebaxa 2019'an de dest bi girtina dîmenên kurtefilma xwe dike, li Mexmûrê listîkvan kom kirin, dest bi girtina dîmenên kurtefilmê kir. Tevî astengîyan jî wî girtina dîmenên filma xwe bi dawî kir.

Sedîq dibêje, "Dema min dîmen temam kir, vê carê stran ji bo min pêwîst bûn. Ez difikirim ka çawa ji bo kurtefilma xwe stran çêkim. Kesî alîkarî nedida, piştî mehekê min karî hinek stran peyda bikim. Li aliyekî min montaja filmê dikir, li aliyê din jî min dixwest bigihînim festîvalên navneteweyî. Ji Tebaxa 2019'an heta Nîsana 2020'an jî ber astengî û zehmetîyan pêvajoya çêkirina kurtefilma çek dewam kir. Vê carê tiştêkî din li ser astengîyan zêde bû, nexweşiya Korona derket, ji ber wê jî hinek din dereng ket."

Sedîq Mijîni dibêje, êdî wî filmê xwe amade kiribû, dixwest bişîne festîvalên navneteweyî. Dema Sedîq jî hevalên xwe re digot, "Ez ê filmê bişînim festîvalan û wê bibe yekem", kesî jê bawer nedikir. Sedîq wê çawa filma xwe bişîne festîvalan, ne hesabekî wî yê bankê, ne navnişanek, ne jî rêyek heye xwe bigihîniye. Dîsa ew bi xwe dikeve nava hewldanan, li ser internetê xwe digihîne navnişanên festîvalan. Sedîq bi rêya wan navnişanan kurtefilma xwe şand, lê gelek ji wan bi pere bûn û qebûl nedikirin. Sedîq ji Dewletên Yekbûyî yê Emerîkayê (DYE), Japonya Rûsya heta Hindistanê filma xwe jî bo festîvalan şand.

Ji ber ku ti derfeteke baş a teknîkê di destê Sedîq de nebû, wî bi kamerayê normal dimenên filma xwe girtibûn. Ji ber wê jî gelek festîvalan di wê kalîteyê de filma wî qebûl nedikir. Hinekane digot, ev film ne li gorî formata me ye, hinekane digot, kalîte ne li gorî me ye û wekî din. Axir Sedîq tevî astengiyên kurtefilma xwe jî gelek festîvalên navneteweyî re şand.

**Sedîq II bendê xelatwergirtinê bû**

Êdi kurtefilma Sedîq di festîvalên navneteweyî de bû, bi rêya internetê gelek peyam jê re dihatin, digotin, filma te hatiye qebûlkirin ji bo festîvalê. Lê armanca Sedîq ne ew bû ku tenê filma wî were qebûlkirin û ji bo pêşbirkê bikeve nava festîvalê. Peyamên bi wî awayî Sedîq qaneh nedikir, ew li benda xelatwergirtinê bû.

Sedîq dibêje, "Carekê peyamek ji festîvala mehane ya Independent Short a li bajarê DYE 'yê Los Angelesê hat. Di peyamê de ji min re gotin, kurtefilma te bû finalist." Sedîq dibêje, ew bi wê peyamê gelekî kêfxweş dibe, piştî kurtefilma wî dibe finalist êdi baweriyê bi xwe tîne, Sedîq jî xwe re dibêje, astengî nikarin mirovan ji serketinê bi paş veixin.

Cara yekem jî Mexmûrê kurtefilmeke di organizasyoneke li DYE 'yê dibe finalist; vê yekê Sedîq bêhtir kêfxweş kiribû. Piştî vê, Sedîq êdi jî xwera dibêje, ew dikare berhemên hîn baştir jî çêke. Sedîq kurtefilma xwe Çek tenê bi 200 hezar dinarên Iraqî çêdike.

Mamsote Sedîq li bendê bû û dixwest bibe yekem. Sedîq dibêje, piştî wê jî gelek festîvalên din name ji bo wî tîn û di nameyan de gotine kurtefilma te di festîvala me de bûye yekem. Ev yek hîna zêdetir Sedîq kêfxweş dibe. Êdi dixwestin jî Sedîq re xelatan bişînin, lê Sedîq wê çawa xelaten xwe bigire. Ne hesabek bankê, ne rêyek û ne jî der-

feteke Sedîq heye. Sedîq jî bê derfetiye nekarî ti xelata xwe bi destê xwe bigire.

**Filmê xelat wergirtinê lê Sedîq wernegirtin**

Ji DYE 'yê xwestin jî Sedîq re xelata wî bişînin, lê pere lazim bû. Sedîq nekarî ti xelatê bigire. Kurtefilma Çek li 43 festîvalan hat pejrandin. Di nava wan 43 festîvalan de, di 6 festîvalan de kurtefilma Çek dibe yekem, di 5'an de dibe finalist. Di 4 festîvalan de jî xelata rûmetê wergirt.

Sedîq Mijîni behsa armanca kurtefilma Çek dibe: "Li ba her Kurdekî çek heye û di mal de tê ragirtin. Di nava me Kurdan de gelek kes bi çekê tene kuştin, carinan li ser zarokê carinan jî li ser bostek ax mirov tene kuştin. Mirov wan deman dibêje, xweziya qet çek nebûya, min xwestiye di kurtefilma xwe de peyama kengê çek pêwîst e û kengê ne pêwîst e bidim. Bi taybet jî bo me Kurdan çek tê çî wateyê. Çek hebe jî mirov dimire, nebe jî mirov dimire. Yê Kurd wê baştir vê yekê fêhm bike, iro Kurd tene kuştin. Kurd hev du dikujin, li şûna ku Kurd li ser bostek ax hev du bikujin, bila li dijî dijminê xwe jî bo axa xwe hemûyî were kuştin. Bila Kurd li dijî dijminê xwe çêke bi kar bîne, bila ne ji bo hev du bi kar binin. Îro axa me jî aliyê dijmin ve hatiye dagirkirin, lê em bêdeng in. Li şûna em berê çêkên xwe bidin hev, bila em ji bo azadiya xwe berê çekan bidin dijminê xwe."

Sedîq Mijîni behsa girîngîdayina bi berheman dibe û dibêje, "Kurd jî civakbûnê vegeriyanê kesitiyê. Di nava me Kurdan de tifaqek nine, kes girîngiyê nade bi berhemên yekî din. Lazim e Kurd jî hev hez bikin, girîngiyê bidin berhemên hev. Di wargehê de jî hîna gelek kes nizanin min xebateke bi vî awayî kiriye. Jixwe heger di wargehê de nebe, jî derve jî kes pê na-

**Filmek jî destaneke dawiya wê xweşî**

Sedîq Mijîni behsa projeyên xwe yê nîha dibe. Ew niha bi berhevkerin û tomarkirina destan û çirokên Kurdî xerîk e. Sedîq dixwaze jî destaneke yan jî çîrokeke Kurdan filmeke çêke. Lê Sedîq Mijîni dixwaze destaneke ku dawiya wê xweşî be, bibe film.

hese. Xelk van xebatên bi nîrx jî xwe re nakin xem, qedir nadin xwe bixwe jî."

**Mexmûrê plûk nebîn**

Sedîq Mijîni bang li her kesî dibe da ku qîmetê penaberên li Mexmûrê bibînin û pê bizanin: "Ji ber ku Mexmûr di her warî de çavkaniyê mezin e jî bo Kurdistanê. Bila li çavê penaberan li me temaşê bikin, lê em penaberên siberoja miletekî ne. Mesele pirtûkên me yê dibistanan iro çavkaniya Kurdî û Kurdistanê ne. Îro bîngehê pirtûkên dibistanên Kurdî, Mexmûr e. Îro dor li Mexmûrê girtine, lê her kes dikare bê Mexmûrê bibîne. Heger festîvaleke Kurdan li deverê çêbe, bila me agadar bikin, em ê jî tevî bibin. Li Mexmûrê hîna çanda komîne heye, tiştên nû hene li Mexmûrê bila herkes were bibîne."

**Festîvalên ku filma Çek tê de bûye yekem**

Golden Valley Global; Filma serketî ya meha Tebaxa 2020'an Pink City International Short Film; Filma herî baş a li ser mafê mirovan Index Film Fest; Xelata Filma Serketî 2020 Tropvill International Film Fest; Filma herî serketî 2020 New York City In Film Romeshouaram International film Pattaya International Film Festival; Serketiyê filma herî baş a Irani ya mehê

**Festîvalên ku filmê Çek tê de xelata Rûmetê wergirti**


Las Vegas Asian Film New Productions Grovedigger Doves's

**Festîvalên ku filmê Çek têde jî bo finalê hat neqandin**

Stokholm International Monthly Award Independent Short Awards Uruvaty International The Chico Independent

\* Li gorî nasnameya wî ya Tirkiyeyê paşnavê wî *Kapar e*, lê ew dibêje, jî ber ku *Tirkan* ev paşnav li wî kiriye, ew bi kar naîne.

\*\* Nîsana 2020'an hat neqandin, lê xelat wernegirt.



# Li ser Rudenko û kurdolojiya Sovyetê

► Lê serketina wê ya esas afirîneriya xebata "Guhertoyên Edebî û Folklorî yên Helbesta Kurdî, Yusuf û Zelîxa" bû. Ev berhem piştî mirina wê sala 1986'an hate weşandin.

► Di nameyekê de Kamuran Bedirxan pesnê pirtûka Rudenko dide, ji bo xwendina edebiyata Kurdî û dibêje, "Vê xebatê deriyê xezîneyên ku di berhevo-kên Pirtûkxaneyê Giştî ya Lenîngradê de hatine hilanîn, vekir."

► Di arşîva Rudenko de nameyêke Î. A. Orbelî heye, tê de ew ji weşanxaneyê dipirse gelo ew ê piştgiriye bide însiyatîfa Rudenko, ji ber ku xwendevanên Rûs vê materyala balkêş nas nakin.



Kurdistan LEZGIYEVA

Margarîta Borîsova Rudenko:  
09.10.1926 - 25.07.1976

**N**avê Margarîta Borîsova Rudenko di lêkolînê rojhilatnasiya Rûsî û biyanî de pîrr tê bihistin û ditin. Jêhatîbûn û behremendiya wê geş, enerjî û kapasîteya wê ya xebatê bêkêmasî ye, û dilsoziya wê ji bo zanistê bêsînor e. Van xisletên wê kir ku ew di jiyana wê ya kurt de evqasî karan bike; û helbet ev ne karê her mirovî ye. Wê di lêkolînê Kurdî de rêgezeke nû çêkir - xwendina edebiyata kurdiya navîn ji destnivîsan. Gelek xebatên wê ji bo lêkolîna folklor û etnografiyaya Kurdî jî çêbûn û wê xwe di ber mijaran de jî êşand.

Margarîta Borîsova di 9'ê Cotmeha 1926'an de li Tîblîsê li malbata zanyarê navdar ê gurg, B.T. Rudenko tê dinyayê. Ew jî li bavê xwe çû, û di fêrbûna zimanê de jî zîrek bû. Wê ji dayika xwe ya pianîst jî hezkirina muzîkê wergirtiye. Bi xwe jî di lêxistina pianoyê de jêhatî bûye.

Margarîta Rudenko zarokatiya xwe li paytexta Gurcistanê Tîblîsê (Tîflîs) bihurand, dûv re malbatê bar kir Lenîngradê. Di dema Şerê Cihanê yê Duyem de, ew û diya wê vegeyriyan Tîblîsê. Lê bavê wê li Lenîngradê ma, gava ku Naziyan dor li bajêr girt. Wî 1942'yan jiyana xwe ji dest da. Piştî bidawîbûna şer, Margarîta Rudenko vegeyriya Lenîngradê û sala 1946'an kete Beşa Filolojiya Îranê ya li Fakulteya Rojhilatnaziye ya li Zanîngeha Dewletê ya Lenîngradê. Wê sala 1951'ê xwendina xwe qedand. Jixwe di salên xwendekariyê de elaqeya xwe ji bo xwendina çand û zimanê Kurdî nişan da. Kurdologê navdar Prof. Dr. Qenatê Kurdo (K.K. Kurdojev) dersên ji bo çand û zimanê Kurdî didan.

## Orbelî serketina wê pîroz kir

Di parastina teza xwe ya bi sernavê "Di hevoka fiil de ji Kurmanciya nûjen ve formên lêkeran", Margarîta Borîsova Rudenko diçû ber destê çavdêrên teza xwe Kurdojev û Bogolyubov. Wan teza wê hêjayê xelatê dit. Wê xwe amade dikir ku bibe zimanzanekê Kurdî. Lêbelê, dema ku sala 1951'ê Rudenko dikeve dibistana seretayî ya şaxa Lenîngradê ya Înstîtuya Rojhilatnaziye, bala wê diçe ser helbesta helbestvanê navdar ê Kurdê sedsala 17'an Ehmedê Xanî, Mem û Zînê.

Li vir nabe em behsa Î.A. Orbelî nekin. Ew teva-hiya jiyana xwe bi helbestê re elaqedar bûye. Axaftina wî di dawiyê 1954'an de li ser parastina teza berendama doktorayê M.B. Rudenko wekî re-qîbê sereke, wiha ye: "Ji bo Ehmedê Xanî, sêmpatiyên min ên kesane zêdetirî 43 sal in heye û zêde jî bûne, her wiha ez kêfxweş im ku îro di Akademiya Zanistan de wek tîz fermî tîn ditin." Di heman demê de akademişyên qebûl kir ku ew jî fêrbûna li ser mijara tezê pir tirsîyaye, ji ber ku helbest ew qas dijwar e ku wî bixwe jî nediwêrî ku wê bide lêkolînera ciwan. Belê Rudenkoyê tirs hemû pûç kirin û Î.A. Orbelî jî dil teza jîneke ciwan a di bin serokatiya Qenatê Kurdo de pîroz kir.

## Mem û Zîn wergerand Rûsî

Li cihanê cara yekem menzûmeya Ehmedê Xanî, Mem û Zîn li zimanekî li derveyî zimanên Rojhilata



Navîn hate wergerandin û ev ziman jî Rûsî bû. Nêzîkî 3 hezar beyt, di wateya hunerî û felsefî de kûr, bi alegorî jî zanyariya nûhatî zanîna hêja ya zimanên Kurdî, Farisî, Erebî û tameke estetîkî ya baş jê re diviya. Zanyarêkî navdar ê wekî M. Hartman bi xwe jî xwe neda ber wergera wê berhemê. Margarîta Rudenko bû pêşengê vê xebata hêja.

Wê heyamê, M.B. Rudenko di Pirtûkxaneyê Giştî de haydar dibe ji hebûna koleksiyonên destnivîsên Kurdî de yê ku konsulê Rûsyayê yê li Erziromê A.D. Jaba - bi eslê xwe jî Lehîstanê ye - di nivê sedsala 19'an de berhev kirine. Çawa wê bi xwe digot, qederê jî wê re bextek xweş vekir, şansek mezin jê re şand. Rudenko bi enerjîya xwe ya asayî û dilsoziya xwe dest bi naskirina destnivîsan kir. Sala 1957'an, wê danasîneke zanistî ya destnivîsên Kurdî di berhevoka Pirtûkxaneyê Giştî de weşand û di 1961'ê de "Danasîna Destnivîsên Kurdî yê Koleksiyonên Lenîngradê" weşand. Ev jî dibe yekemîn kataloga destnivîsaran di dîroka kurdolojiyê de. Ev xebata ku jî bo dîroka lêkolîna çanda gelê Kurd bû bûyereke giring, kir ku nav û dengê zanyara ciwan jî çêbe. Di nameyekê de ji Parîsê, kurdnasê navdar Kamuran Bedirxan pesnê pirtûka Margarîta Borîsova Rudenko dide, ku jî bo xwendina edebiyata Kurdî ya dewlemend xwedî nirxekî mezin bû. Kamuran Bedirxan bi van hevokan dibêje, "Vê xebatê deriyê xezîneyên ku di berhevokên Pirtûkxaneyê Giştî ya Lenîngradê de hatine hilanîn, vekir."

Li dû vegotina destnivîsên Kurdî, M.B. Rudenko dest bi lêkolîna wan a sistematîk dike. Ew dişa li "Mem û Zîn" a Ehmedê Xanî vedigere, ji ber ku di berhevokê de neh destnivîsên wê berhema menzûm hebûn.



Î.A Orbelî xeyal dikir ku teksta helbestê bi wergerê re wekî pirtûkeke cuda biweşîne da ku bibe berhemeke sermaseyê ji bo bi hezaran Kurdan, ne tenê li Sovyetê lê li derveyî wê jî. Û Margarîta Rudenko ew ji bîr nekir, pirtûka wergera "Mem û Zîn" a Ehmedê Xanî ku sala 1962'yan hate weşandin, wê diyarî bibiranîna wî ya pîroz kir. Ew li gorî têzek karek bi tevahî cûda bû. Di kî-têbê de nivîsek rexnegirî ya ji neh destnivîsan û bi xwendinên cihê hatî çêkirin hebû, li cem wergerê verastkirî. Vê wergerê bala gelek helbestvan û wergêrên Sovyetê kişand. Axir xuya bû ku wergerandina beytên Ehmedê Xanî pîsporiyeke helbestî ya biqasî helbestvanekê/i hewce dikir.

### Şahesera wê piştî mirina wê hat weşandin

Wê dîv re dewam kir û nivîsên rexnegirî û werger weşandin. Van xebatên M. B. Rudenko ji bo zanistê gelek nav û abîdeyên wêjeya serdema navîn veditin. Wê helbesta Feqiyê Teyran "Şêxê San'an" û helbesta Haris Bidlîsî (sedsala XVIII) "Leyl û Mecnûn" weşandin. Lê serketina wê ya esas afirîneriya xebata "Guhertoyên Edebi û Folklorî yên Helbesta Kurdî, Yusuf û Zelîxa" bû. Ev berhema piştî mirina wê sala 1986'an hate weşandin.

Di arşîva Margarîta Rudenko de ku li St. Petersburgê li Saziya Zanistî ya Budceya Dewleta Federal tê parastin, cihêkî taybetî ji dersên li ser edebiyata Kurdî ya serdema navîn tê girtin. Di Nîsana 1970'yî de li Fakulteya Rojhilatnasyîyê ya Zanîngeha Yêrêvanê van dersan dîde. Bi edebiyata klasîk a kurdî, bi xebata Elî Herîrî -li gorî Qenatê Kurdo sedsala XI - dest pê dîke û bi şopdarên Ehmedê Xanî - helbestvanên sedsala 18'an - bi dawî dibe. Her wiha Murad Xan Beyazîdî û Haris Bidlîsî jî di nav de ne. Dersa dawî ji bo çerxa edebî ya li hewşa serwerên Abramani, yên ku bi Goranî (sedsalên 17-18) nivîsandine vediqetîne. Gotar nêzî 350 rûpelên destnivîs in. Derseke wisa, ew care yekê bû ku li Sovyetê hate dayîn. Ev ezmûna yekem a têgihîştina zanîna berhevkerî pê hate kirin. Ev dersên ku bi gelek nimûneyên ji helbesta navîn a Kurdî hatine xuyakirin, dikarin ji bo lêkolîna edebiyata Kurdî bibin çavkaniyeke heja.

### Wergera Rûsî ya teza Îhsan Fuad

Di arşîvê de wergereke ji teza Kurdî ya xwendekarekî Îhsanê ya Înstîtuya Rojhilatnasyîyê yê ji Başûrê Kurdîstanê - fermî ji Iraqê - ji bo xwendinê hatiye, yê bi navê Îhsan Fuad jî heye. Ew di teza xwe de bi helbestvanê navdar ên sedsala 19'an Hacı Qadirî Koyê daketiye. Margarîta Borî-

sovna, li ser daxwaza Qenatê Kurdo qedere 350 rûpelên destnivîs kiriye. Lê ev berhema nehatiye weşandin.

Margarîta Rudenko tenê bi xwendina çavkaniyên nivîskî razî nebû. Di berhemen xwe de têkilî û bandora hevbeş a edebiyat û folklorê Kurdî eşkere kir, ew timî bi hunerê folklorî yê dewlemend û cihêreng ê Kurdan re elaqedar bû. Ew çend caran çû herêmen Kurdan ên li Ermenîstan, Gurcîstan, Azerbeycan, Turkmenîstanê ji bo tomarkirin û weşandina zargotinê û helbestên serdema navîn, û her weha berhevkirina destan, çîrok, gotinên pêşyan û biwêjan.

Hê di dema xwendekariyê de wê çîrok nivîsandine, wergerên ku wê yekser piştî parastina teza xwe ya doktorayê amade kirine hene. Di arşîvê de nameyêke Î.A Orbelî heye, tê de ew ji weşanxaneyê çîrokan dipirse gelo ew ê piştgiriye

bide inisiyatîfa zanyara ciwan, ji ber ku xwendevanên Rûs bi tevahî wê materyala balkêş hemûyî nas nakin û weşana wê de bi milyonan biyaniyî kêfxweş bike û nexasim jî Kurdan, ji ber ku balê dikişîne ser mîrateya çandî ya gelê Kurd.

### Karê wê yê li ser etnografîyaya Kurdan

M.B. Rudenko bi berferhiya lêkolînê xwe hate nasîn. Di çend berhemen wê de - li ser daweta Kurdan, li ser cejna sersalê, li ser orf û adetên Kurdan û wekî din - mijarên etnografîyê hene. Materyal û tezên ji bo dersa sala 1970'yî a bi navê "Kurd: Exlaq, Adet û Çand" ên ku li salona dersê ya Branaxa Leningradê ya Înstîtuya Rojhilatnasyîyê jî balkêş in.

Di heman demê de gotara nêweşandî "Hin baweriyên Kurdan û kevneşopiyên Asyaya Rojavayî" balê dikişîne ser baweriyên bi rojên hefteyê, dema derketina rojê, qêrîna teyrana, agir, keskesor, bi diyardeyên cihêreng ên fîzyolojîk tene ravekirin. Mijarên weke çav, xurîn û wekî din êb bi xwarinê, bi îşaretên ku bi hatina mêvan re têkildar in jî hene. Baweriyên efsûnî (çavê xirab, amulet, bextreşî), çanda keviran, parastin û hewandina cihên pîroz tê vegotin, analogên bi baweriyên gelên cîran re tîn danîn. Gelek mijarên ku bi edebiyata Kurdî ya serdema navîn, zîman, folklor, etnografîyê ve elaqedar in, bi sernavên "Li ser pîrsa edebiyata Kurdî", "Beytên nenas ên Ehmedê Xanî", "Edebiyata Kurdî ya sedsala 17'an.", "Helbestên helbestvanên Kurd ên çapnekirî", "Gotin û gotinên pêşyan ên Kurdî", "Pergalên guherînê di helbesta klasîk a Kurdî ya navîn de bi zaravayê bakurî" û gelekên din hene di arşîva wê de.

Margarîta Rudenko heta dawîya jiyana xwe, bû nûnereke geş a dibistana rojhilatnasyîyê Rûsî, damezrînera lêkolîna edebiyata klasîk a Kurdî, wê tevkarîyeke mezin ji bo bipêşketina kurdolojiyê kir. Wê bi fedekarî û evîni xizmeta zanistê kir. Wê bêyî ku xebatên xwe yê zanistî rawestîne, pirtûkên "Yûsif û Zelîxa" û "Helbesta Ritualî ya Kurdî" jî çapê re amade kir.

Di salên 60'yî de, di yekê jî civinên beşê Kurdî yê Yekîtiya Nivîskarên Ermenîstanê de, dema ku dor hat weşandina berhemen Margarîta Rudenko bi zîmanê Kurdî li Yêrêvanê, yekî jî nivîskaran got, "Dem wê bê gelê Kurd wê abîdeyekê ji vê jinê re çêke."

Esas wê bi berhemen xwe, abîdeya herî baş ji xwe re çêkir. Taybetmendiya xwezayî, hişmendî, kesayetiya geş, xîreta awarte rê da Margarîta Borisovna Rudenko ku di jiyana xweya kurt û trajîk de pir tiştan bike. Wê 25'ê Tirmeha 1976'an hîna 50 salî bû wefat kir.



# Neolojîzm û helbesta Kurmancî

► Erd AGRON\*

Wêke meyleke hunerên vegotinê, neolojîzm hin deman li ziman û wêjeyê dide der. Li gora pêdiviyana peyvên nû tîn dariştin, li hev tîn anîn û wateyên nû li hin peyvên kevin tîn barkirin û bikaranîn. Pergala ziman bi vî awayî xwe nû dike, dewlemend dike. Helbet di serdema me de pêdivî bi peyvên nû heye. Serdema teknolojiya ragihandinê ye. Divê li gora vê, têkiliyeye aktîf di navbera ziman û serdemê de were danîn. Lê xeter, neolojîzma di wêjeyê de ye.

Meyla neolojîst di helbesta Kurmancî da (bi teybetî li Bakur) pirr li pêş e. Helbestvanên ciwan bêhtir rahêjin vê rêbazê jî helbestvanên me yên ku em dikarin bibêjin, êdî di helbesta xwe de kamil bûne jî bi îsra vê meylê didomînin. Ji bo helbestkarên ciwan, mirov dikare weke şîret bibêje, ev tiştêk baş nîne.

Helbet meyla vê nivîsê ne dijberiya neolojîzmê ye û arxaîzmê ferz nake. Helbestvan dikare bi awayekî afirîner sêwirandina xwe qaîm bike û bi peyvên wê/wî dariştine jî bine ziman. Dikare peyvên kevin bi wateyên nû jî bi kar bîne û ferhengêkê jî ji xwe re çêke. Serketin, behremendî û afirîneriyeye di vî warî de wê tesîr li xwîneran jî bike. Lê belê hesasiyeteke jî dil ji derbarê rê û rêbazên ziman û têgihîştina xwîner de ferz e. Lê ku ne bi hesasiyeteke fikirandî, bi awayekî tewkel û teala hatibe dariştin, ew peyv tenê hingê dikare bibe bargirani li ziman û helbesta helbestvan.

Di helbesta Kurmancî (li Bakur) de bi pirranî peyvên hatine dariştin bûne bela serê ziman. Jixwe hîn nû nû xwendin û nivîsandina Kurdî bi pêş dikeve. Îca ev meyl bi vî awayî dibê sedem ku çavê xwîner bitirse. Jixwe qalibê "Kurdiya akademîk" bûye bela û sedemê reva jî Kurdî.


Wê rojê gardiyaneke peywendîdar hatibû, digot "Pirtûkên ku ji we re hatine bi zimanekî akademîk hatine nivîsandin. Em di dana xwendinê de zoriyê dikişînin" û derengxistina pirtûkê rave dikir û sinjalên qedexekirinê didan. Wan ji ku ev hêncet bihist û niha qedexekirinê bi akademîkiya zimanê pirtûkê dixwazin rave bikin. Te bivê heta êvarê bibêje, akademiya çi halê çi...

## Neolîzm lê bi peyvên tîn fêmkirin

Lê belê, divê em bersîva pîrsa, "Çima meyla neolojîzmê?" bidin. Dibe ku gelek sedemên bi helbestkar û kesayeta wî/ê ve eleqedar hebin. Mirov bi rêzdarî van sedeman jî muxatebê wan û lêpîrsîna wî/ê re bihêle baştir e. Lê sedemek heye ew jî me hemûyan (nivîskar, xwîner, edîtor, belavkar, civak û wekî din) elaqedar dike: Dewlemendkirina ziman, dewlemendkirina vegotinê.

Di jiyana mirovan de dewlemendî bûye armanca sereke. Bextewarî di dewlemendiya madî û manewî de tê ditin êdî. Gelo herçî ku dewlemendiya madî û manewî jî bo xwe kiribe armanca sereke, ew ê karibe hay ji rastiya jiyane hebe û bi wê bijî?

Esaletêke xizaniyê jî heye. Nietzsche dibêje, "Di ziman de nûbûn çêkirin yan jî xwezîya xwe bi yê kevin anîn, ya ne edetî û kêmditî vebijartin, di şûna kêmkirina hebanoka peyvan de hewildana dewlemendkirinê, ji bo her demê, daneya ecibandineke nekamilbûyî yan jî dejenerabûyî ye. Hunermendên xîtabê yên Yewnana Kevin bi xizaniyeye biesil, lê di



**Wê rojê gardiyaneke digot "Pirtûkên ku ji we re hatine bi zimanekî akademîk hatine nivîsandin. Em di dana xwendinê de zoriyê dikişînin" û derengxistina pirtûkê rave dikir. Te bivê heta êvarê bibêje, akademiya çi halê çi...**

halxweşiyeke sade de bi hostayî azadî nişan didan." Belê em tevî kêmkirina hebanoka peyvan nebin. Lê divê, helbestvan karibe bi zimanekî ku tî fêmkirin, hest û ramanên xwe bîne ziman. Ji bo ku weke hêmana bibixistinê na vegotina helbestê pêk were, gere peyvên tîn zanîn werin bikaranîn.

Heger mesele dewlemendî be, Kurdî jî gelek zimanan dewlemendtir e. Îstatistîkeke Wikipedyayê digot, Kurdî bi hêsdê û tiştêk hezar peyvan di nava zimanan de di warê dewlemendiya de nehemîn e. Li gel vê jî helbestvanek bi meyla neolojîst tev bigere, ew ê şaş be. Hozan, hilgirên wate, ziman û çanda civak-neteweya xwe ne. Divê ev berpirsariyê û binbarî neyê jîbirkirin. Helwestên bêberpirsiyar helwestên rewşenbîrê burjûwazî ne.

Ji bo çend mînak peyvên dariştî, di tinehiya zindanê de min çavê xwe li çend pirtûkan gerand. Ez navê pirtûk û helbestvanan nebêjim. Jixwe dê herkes peyvên xwe nas bike: "şinmorî, şeveheyy, sîwêne, zerdîran, dûrerê, sêvmemik, malreşin, tarîreşk, golxwêdan, çirageş, êvarhênik, zertav, gorêpan, helbestrijî, kesertijî, sorsêv, kuştewar, tarîreş, şinxeyal, keçzarok, berfspi, hişketer, dergûşmayî, kerpîçmayî, tîrsmayî, dorspîçak, darspî, pûçmayî, piçmayî, keçbûk, şinsor, şevgûzan, keçxama, destlep, çerxewewr, jêrkon, darkursî, koksî, kokşîlan, gozelkew û hwd."

Ez li xwe jî mukir bêm. Demekê ev meyl li min jî peyda bûbû. Min jî bi qasî tê bîra min peyvên weke "subhankil, korebajar, û korêrê û hine din" dariştibûn. Min dikaribû bigota "kilê sibhani" û "bajarê kor" jî. Wê demê wê dê bi nîrxê xwe yê fonetîk û semantîk bêhtir reng bidana vegotinê. Lê bi wî halê xwe pir fiq û çêkirî mane.

## Çima memiksêv bû sêvmemik?

Bi ya min helbestvanên me yên qedirbilind û li ber dilê me şêrîn jî dikaribûn li şûna peyva "sorsêv" bigotana "sêva sor", li şûna "tarîreşk"ê bigotana "tariya reş", li şûna "berfspi" bigotana "berfa spi", li şûna "darkursî" de bigotana "kursiyê dar." Hin mînak bi rastî jî zor in. Em xwe lê neqelibînin baştir

e. Lê mînakek heye bi rastî jî ez nizanim çima wisa bûye ku ew jî peyva "sêvmemik" e. Awayê wê yê arxaîk ku di wêjeya me ya devki de cih girtiye "memiksêv" e. Di kilamên dengbêjan de jî tê dubarekirin. Lê çima bûye "sêvmemik" ez jî nav derneketim. Heger mijar dara sêvê be û sêv bi şibandina memikan tîn ravekirin, ew tiştêkî din e. Lê ne wisa ye jî.

Li şûna "keçzarok" helbet dikaribû bigota "zaroka keç" jî. Ma ji bo kuran dibêje, "kurzarok"!

Ne newayeke van peyvan heye ku mirov di bin tesîra wan de bimîne, ne jî nîrxekî wan ê bibixistinê heye ku rê li ber wateyên nû veke yan jî wateyên nû hilberîne. Peyvinê xav in.

Heger di helbesteke klasîk de bûna, me dikaribû bigota helbestvan mehkûmê rêzebendê ye. Lê helbest jî modern û serbest e.

Divê ku helbestvan peyvên ku jî kûrahiya dîrokekî nizilîne, bi dubarekirin û watelebarkirinan reng û şeweyên xwe girtiye, hêza wan a bibixistinê bilind e, bi kar bîne. Bi van peyvên ku di hêla semantîk, fonetîk û morfolojîk de gihastine nîrxên xwe yên herî bilind dê helbesteke resen jî were îşakirin.

## Ji vir û heta ba Xwedê

Helbestvanên Kurd niha bi bar û binbariyên cuda re rû bi rû ne. Ji aliyekî ve îşakirina ziman, ji aliyekî ve avakirina helbesteke nû-resen (ji bo ku nebe dûvika helbesta xelkê), ji aliyekî ve berpirsariya têkiliyên nû afirandinê di wê civakê de ku wê jî nû ve were îşakirin... Ji ber vê yekê di afirandina ziman û berpirsariyên xwe de hevgerî di vegotina helbestvan de ferz e. Wê çaxê, ewilî zindikirina peyvên qalîk girtine, hişk bûne, dejenera bûne û li ber mirinê ne, peywira helbestvan a sereke ye.

Gelo helbestvan wê qet neolojîzmê bi kar neyîne? Na. Dikare bi kar bîne. Dema ku gihîşt aseteke bilind û êdî zimanê me bi pergala û dîroka xwe têra sewirandin û vegotina wî/ê nake, dema ku dilziziyên ku lê nehatine kirin rabihîze, dikare neolojîzmê bi kar bîne. Heger derdora meriv tije peyvên birîndar û bêjeyên li ber mirinê bin; peyvên ku bi hiş û binehişîya kolektîf a civaka me dewlemend û êşa gelê me rave dikin, hebin; hest û wateyên ku em radibihîzin û lê difikirin karibin bi çend peyvên di ferhengan de werin ziman û li şûna li ferhengêkê nihêr-tinê, meyla neolojîst jî vir û heta ba xwedê şaş e.

\*erd Agron ji 2001'ê ve girtî ye. Niha li Girtigeha Şakranê dimîne.

# Nameya çiyayên nemir

JAN JAR

Piştî bêhnvedanê û çayêke tarî  
Ez vê nameyê dinivîsînim, min nameyên bin  
axê û nameyên di bin berfê de hemî derxistin.  
Gotinên li çiyayan, rojnivîsên, şervanan, yek bi  
yek rêz dikim. Min hemî rîwayet, hemî leheng-  
yên wan û efsaneyên wan danîne ber xwe.

Xeyalên dirêj ji, hêviyên çiyayan ji, bi vê na-  
meyê dinivîsînim.

Dema gewdeyê me, bedena me, li ser kevirê  
şaristanîyê bilind bibe. Yek wê rabe, zinarên bi-  
lind ramîse. Di bin baranê de dest bi rêwitiya  
jiyanê bike.

Ev ji wê wek me, di şerê de ehdekê li canê  
xwe bixe, ji bo rûmeta xwe, ji bo welatê xwe û ji  
bo neteweya xwe.

Ev nameya li çiyayan, ne ya despêkê ye û ne ji  
ya dawiyê ye. Lê em ji bilî çiyayan, ji tiştêkî mi-  
netê nakin. Lê bi vî şerê me ji tiştêkî wê ji kîsê  
xwe neçe.

Ejdeha ji bin, me li beramberê wan şer kir,  
mêtinger, efendî ji bin me serê xwe li ber wan  
neçemand. Ev ava dirêj ji dizane ev esmane şin  
ji ne bê xeber e. Me zanyariya zozanan, zanya-  
riya van kendal û berpalkan danîye pêşiya xwe.  
Li vir guleyên herbê ji diteqin. Yê li vir şer  
dikin, bi rêûresma berxwedanê xweş dizanin.

Tenê niha fikarên me, ew kes in ku ji rojê bi  
guman in. Em li vir şûrê xwe beramberê wan di-  
kişînin. Berê tîfinga me li wan e. Ewên axê dagir  
dikin û yê welatê me kirine, mêtingeh.

Me hemî zamanên xwe di havin, di mij û mo-  
ranê de derbas kir. Me lingên xwe ji di berfa  
sedsalê de şewitandin. Li vir şer ji germ e havin  
ji germ e.

Tiştên te wendakirî, xaçerêka te ye, ev sê meh  
in, li wê newala kûr, tîfing li ser milên wê ye. Yê  
li vir şer dikin, ji despêka xwe vedigerin.

Em di vê herbê de li straneke dirêj ji guh-  
darî dikin.

Ev sê meh in,  
Me bi xwe, li Zap, Avaşîn  
û Zagrosan li berama-  
berî vê artêşê xwe bê  
minet kirîye. Li vir her  
kes şûrê xwe diki-  
şîne. Di vî şerî de  
şev diaxive û roj ji  
olaneke kûr dide  
me.

Ev bi xwe bi debabe,  
bi balafir û tankan, zirx-  
lixwekirî tîn. Çav berdane  
çiyayên me yê gewr û esmer,  
fêkiyên me, daristanên me dibirrin.  
Xewa xezalan diherimînin. Hêlîna çivîkan ta-  
rûmar kirine.

Destên xwe li wêrekiyê pêçane. Çiyayên bi-  
lind li me tîn, em xwediyê vir in. Em Hektorên li  
Kurdistanê ne.

Divê Pavlo; ji me re li çepikan bixe. Em li dora  
xaniyê sê qat û çar qat, şer nakin. Me, sînga xwe  
daye ber çiyayan, sînga xwe daye ber darista-  
nên qedim.

Divê Pavlo bibêje; 'Hûn weke çiyayên xwe,  
bedew û esîl in'. We di hemî zemanan de xwe  
bi axê re kirîye yek, mirin ji, mayîn ji, li me tê, di-  
roka avê, diroka azadiyê, bi me dizane û me di-  
nase.

Em li vir  
Ji jiyandê  
muhteşem hez dikin. Tenê baranek- e bi  
nermî, ji me re lazim e,

Ji bo em dilê xwe bi vê herbê, beher in.  
Îmana me agir û wateya nav dilê me ye. Di-  
qîre, olan e, caran ehdek e, caran berbang e.

Me, çiya ji xwe re kirine sicade.  
Xwêdana me li ser zinaran difûre. Şekir û xwê  
ji di bin çenteyê me de heye.

Ev  
Ne herba  
Cîhanê ya yekê ye.

Stêrk li jor xwîn li jêr dirije. Rojnivîsên ku li vir  
tên nivîsandin, hemî li ser eniya zarokêkî diçil-  
wile. Li vir êşên me diêşin, me şerêkî bêeman  
daniye pêşiya xwe. Heyf li wan, nizanin em ji bo  
çî, ji bo kê li vir in. Me di vê havînê de Hezîran û  
Tîrmeha germ li gel xwe kom kirine.

Dirok dizane, wê me çawa defîn bike, wa pa-  
yizeke hezin ji Êlûn û Cotmeh ji li pêşiya me ye.  
Çiyayî bi zîmanê xwe dibêjin, 'wê taritîyek bê di  
ser çiyayan re ronahiyek, çirûskek derbas bibe,  
yê li vir hemî Kurdistanî ne, ti kes li Bolîvya û li  
Spanyayê nayê şer.

Rojnivîsên xwe yê şer ber êvaran dinivîsînin.  
Şerê me li vir bi dijarî didome, em di bin te-  
yare, bombe û F-16'an de li ber xwe didin. Me li  
seran-

serê Avaşîn, Zap û li Zendûra, awirên xwe tûj ki-  
rine.

Em nahêlin baskên çivikan jêkin.  
Hevrêyeke min, di nameyê de nivisandîye û  
dibêje; 'yên li vir dil pola ne' Cixareya min tutin  
e,

Gabardinek li ber min e, xwêdana min ji axê  
difûre.

Ev ne şerê tîr û kevanê ye. Yê li vir rahiştine  
tîfingê, qirneke çeper girîtine, keviyên berfê  
belek in. Belkê, çûne tava heyvê bi xwe re  
bînin...

Ez li ber destê sibê rabûme, dest bi nivîsan-  
dînê dikim. Ev nameya min a despêkê ye. Bel-  
kê nîkarim behsa serboriyên li vir bikim. Lê  
yên li vir şer kirine caran; bîrnax xwe pêçane û  
careke din xwe didin ser zinarên bilind.

Ti kes nîzane, me xeyalên xwe di ser vî çiyayê  
bilind re bihurandin.

Em li pey zemanên bihurî nakevin. Westê me  
nîne. Tiştê ku li benda me ye, rê ye, rêwîti ye.

Divê Pavlo, ji me re li çepikan bixe,  
Em, nihâl parastîna xaniyekî çar qat nakin, ev  
der Stalingrada çiyayan e, nameyên me kevnar  
in, me keştiya azadiyê, ber bi qiraxê ve bi rêxistî  
ye.

Artêşa ku em li beramberê wê şer dikin, kêli-  
yên li vir xwîn mij in, mesela ev artêş dikare hê-  
lîna çivîkan xirab bike, daristanan dişewitîne.

Kurtûkurmancî, pivanên xwe yê şer tîne ne.  
Heger armanca me tenê parastîna bajarekî  
bûya, gelekî bûya,

Nihâl me serketîna xwe ragihandibû. Lê yê  
beramberê me serhişk in û em ji, ji wan serhişkîr  
in. Ev artêş dixwaze, bilindbûna çiyayan qedexe  
bike, bombeyan dibarîne, çekên kîmyewî bi kar  
tîne, şevê serjê dike, neyarê hestiyên me ye.

Ev artêş sedên salan e dijmînê dara giwîjê ye,  
dijmînê dara maziye ye. Em bi vê artêşê re, ti  
dever nema ku me şer nekir, em neketin cengê,  
Me Başûr bir, li Bakur danî, me Sefîn, Cudî,  
Bêxêr bir, li çiyayê Sîpanê danî, lê şerê  
me yê ji bo rojê, neqediya.

Me, ji bo rûmeta welatê  
xwe şer kir.

Me bedena xwe,  
gewdeyê xwe, ji xwe  
re kir balgîf, me ji bo  
gelekî, ji bo netewe-  
yekî, şer kir, doza wan  
dirêj, çiyayên wan yê  
ku rê nadin ji hene.

Yên ji nava me çûn,  
Şopa wan

0

Nameyên wan li vir û li nav çiy-  
yayan dimînin.

...

*Hespê komeyt siyar bûma,  
Ji çiyê ber war bûma,  
Bimama bê deng û nav  
Her tek tenê zar bûma.*

*Sibê zû ve şiyar bûma,  
Pêxas û bê şal bûma,  
Lingterikî, lêvên ziha,  
Xwezil dîsa zar bûma.*

*Seîdê Îbo*



Foto: SAFIN HAMED / AFP